


Ji Komîsyona Çavdêriyê ya Girtîgehan Av. Eren Keskin:

# Berpîrsên rastîn ne li holê ne



Hevpeyvîn bi Parêzgerê Dihokê  
Abdûlezîz Teyîb re

'PKK hêzeke bakurî ye'

Röpel 4

Nûçeya Ezna Maya:

Dixwazin Dêrsimê  
vala bikin

Röpel 6

Helîm Yûsif bi parlementerê kurd  
ê berê yê Sûrî Fuat Elîko re axivî:

Me xwest em doza kurdî  
bixin rojeva parlementoyê jî

Röpel 8-9

## NAVEROK



Metin Aksoy: Welatparêzekî berxwedêr bû Osman Sebrî

7



Medşer Rêçnas: Xelata Gulê

12



Şewqî Elbakî: Stareya qaçax û evîndaran Dêra Axtîmanê

16

Jî  
Xwendevanan

**MAMÊ** Mûsa, me tu ji bîr nekîri. Ne tenê me; tu kesî tu ji bîr nekiriye. Hefteya çûyî 78 saliya te bû, ew porê te yê spî yê delal, ew zarê te yê şîrîn û dilxwaziya te ya dilonanî, wê tim ji me re bibe mînak û destan.

Mamê hêja: çawa jiyana te ya qenc û bi kar ji bo kes û civatan bûye ronahî, bûye find û fanûs ji bo xebata pêşveçûna serxwebûna gelê te û gelên cîhanê yêñ mafxwaz, jînxwaz û azadixwaz, her wisa jî çayîna te, barkirina te ji, wê bêguman bibe sedema yekîti, biraşî, hisyari, rabiûn û xîreta gelê te.

Bila canê te pak, sad û hêsan bimine.

M. R. PALE

**DİROKA** kurdan bi destê kurdan tê nivîsandin. Berê dîroka me ya derewîn û çewti bi destê dijminê kurdan dihat nivîsandin. Gelo berê ji bo çi dîroka me bi destê dijminan hatiye nivîsandin û iro ji bo çi bi destê me tê nivîsandin, emê vê yekê çawa ji hev derxin?

Gelê kurd û rîberêr kurdan ên berê bi devê dijminan û bi hêzên dijmin re radibûn ji bo azadiyê û dîsa jî bi desten dijminan dihatin pêlçiqandin, qetikirin. Lî belê iro ne wisan e. Gelê kurd bi bîr û baweriyeke xurt li dû serokatiyeke rast dimeşe. Ji bo xelasî û azadiyê gelê kurd, dev ji canê xwe, malê xwe, erdê xwe, bax û baxçeyen xwe berdaye. Berxwedana gelê kurd, berxwedaneke werê bi zanîn û bi baweriyeke xurt e ku dijmin şas dibe. Dîroka kurd û Kurdistanê tê nivîsandin, li hemû kurdan pîroz be.

EVDILE FIRAT

W

## Vê metodê dora xwe kir

MEHMET GEMSİZ

Serê çendik û çend salan e ku kurd, ji bo ku hebûna-xwe bi cîhanê bîdine pejirandin, metodekê bi kar tînin, ku bi vê metodê kurdan xwe jî hisyar dikir.

Bi ya me, di destpêka salên 90'î de êdî ev metoda ku ji xwe re hisyarkirina gelê kurd û danasîna hebûna wî kiribû armanc, gihiya mebest û kama xwe. Serhildanê gel, şahidîn vê yekê ne.

Ev gotinê me li ser bakurê welatê me ne.

Metoda ku em jê behs dikin, di gelek warênen xebat û têkoşînê de hate bikarannîn. Di xebatêni siyasi de, di xebatêni propagandayı de, di hunerên bedew de; di hemû çesnîn edebî de, di muzîkê de, di xebatêni li ser dîrokê û hwd. de.

Çawa me di serî de got, gelşa xwenasîn û xwedanenasînî li ber kurdan hebû. Gelê kurd ji her hêlî ve, ji aliyêne.

dewletêni dagirkir ve dihate înkarkirin.

Bivê nevê, li hemberî vê helwestê, kurd jî diketin rewşa xweparêziyê û lê dixebeitin ku hebûna xwe, ji aliyê zîmîn ve, ji aliyê dîrok û şaristaniyê ve, ji aliyê wêje, hunerî û hwd. ve, bidine peyitandin (ispatkirin)

Li bakurê welêt, bi vê metodê tiştînî baş hatin kirin, hisyariya gelê me yî bindest pêk hat. Jehra ku berdabûn mîjîyê gelê me, hate bêtesîrkirin. Gelê ku ji devgerê ketibû, hate ziman. Metodê rola xwe, erk û vatiniya xwe anî cih.

Kurdan bi vî awayî di warê têkoşînê de merhaleylek li dû xwe hişt.

Rastiyekê welê li pêşîya me ye ku jê re tu guman nîn e. Ew jî ev e, divê ew metod bê guhertin, pêwîstî bi metoda li ser rizgarikirin heye. Nûkirina metodê ji bo me êdî bûye tiştîkî tênebihur û jêneger.

Serokê Tevgera Azadiyê vê rewşê

waîa tarîf dike: "Hisyarkirin temam e, îca dora rizgariyê ye".

Lî di pratîkî de, bi taybetî di eniya çandî de em başebaş rastî xebatêni ku bersiva gotina "Hisyarkirin temam e, îcar dora rizgariyê ye" bidin, nayê.

Der barê metodê de têne, bi awayekî xuyayı, li ser şêweyê nivîsına dîroka kurdî xebat tenê weşandin û nîqaş çedîbin. Di warê din de em leqayî tiştîkî berbiçav nayê.

Nivîskar, helbestvan, wêjevan, siyasetmedar, zanyar, dîrokzan, stranbêj, dengbêj, muzîsyn, şanqer, çiroknivîs, romannivîs, bi kurtaşî her şexsekî kurd divê êdî di berhemên xwe de cih bidin temayên li ser rizgariya kurdan. Civakeke çawa, pîrgaleke çawa, yekîtiyeke çawa, bihevrebûneke çawa... dixwazin, divê eşkere bikin.

Metoda pêşîn ji bo merhaleya pêşîn bû, wê dora xwe kir. Îcar hewcetiya metoda nû xwe eşkere kiriye.

Ronakbîren me, hunermendê me, nivîskarîn me, siysatvanen me... divê bala xwe bidine ser vê yekê û wê pêwîstiyê qenc bibîn. Da ku em karibin di warê çand û hunerî de jî bersiva demê bidin.

Kela berxwedanê  
Zîndanê Amedê

Hevalên min ên zîndanê dihatin ber çavê min, gava ku me bi hev re nan dixwar, çay vedixwar, kilam distran û qala jiyanê dikir. Lî ji her tiştî xweştir, em 90 heb heval bûn di qawîşê de gava ku me dîlan digirt, dengê stranên me diçûn û mîzgîn didan hevalên din. Dengê lingên me tirseke mezin dixist hundîrê dijmin.

Tûrê kartolan' dikir. Min dikirî dîn bîbim, min dit Şevket Kazan derket û got qawîşa 29'ân gava çûne hevditinê lingê girtiyekî şemitiye û ketiye xwarê; ji ber vê yekê pevçûn çêbûye û neh kes mirine. Nizanîn çiqas birîndar hene.

Wê çaxê ez sar bûm. Ez nû ji zîndanê derketibûm, min gelek hevalan nas dikirin. Û neh heb hevalê min şehîd ketibûn, lê ez geleki ji wan dûr bûm. Çavê min tijî hêstir bû, ne ez karim bigirîm ne ji bi hevalên xwe yêñ menzelê re biçeyivim.

Hevalên min ên zîndanê dihatin ber çavê min, gava ku me bi hev re nan dixwar, çay vedixwar, kilam distran û qala jiyanê dikir. Lî ji her tiştî xweştir, em 90 heb heval bûn di qawîşê de gava ku me dîlan digirt, dengê stranên me diçûn û mîzgîn didan hevalên din. Dengê lingên me tirseke mezin dixist hundîrê dijmin.

Di dîlanan de hevalê Memet Emîn hebû, emrê wî 70 salî bû, tim diçû serî li xwe dihejand. Kezeba wî wekî çiya-yê Gebar. Dilê wî wekî behran fireh bû.

Lê êrisîn dijimin di serê min de diçûn û dihatin. Berxwedana hevalan, dihat bîra min.

Her bi serê xwe fedekar, qehreman û mirovîn zana bûn. Ew tîrsa zanatî, mîrxasî û qeremantî ye ku ketiye hundîrê dijmin.

Belê Zîndana Amedê, ji rezbera 1980'yi ûvir de gelek berxwedanî nîşan daye, ew bû kela berxwedanê her dem li hemberî dagirkiran û kolonyalîstan.

Gawa ku qala Zîndana Amedê dibe mûyê serê mirov gjî dîbin. Di cîhanê de gelek berxwedanî çêbûne lê tu ne wekî berxwedana Zîndana Amedê ne.

Ne karê her kesî ye ku bi hev bigirîn û agir berdin canê xwe.

Ne karê her mirovî ye ku di cihekî bi qasî metroyekê de û bêñ bavêje stû-yê xwe, xwe bixiniqîne. Dîsa ne iş û karê her mirovî ye ku 63 rojan nan nexwin û avê venexwe û hetanî şehîd bikevin.

Belê, qehremanî me mirin kuştin û bi ser mirinê ketin. İro jî qehremanî me hene bi dehan, bi hezaran.

NAZMÎ KIRIK

**B**elê iro ez û hevalên xwe li dora maseyeke çarkoşê rûniştibûn û li ser çand û hunerî dipeyivin.

Gava ku min serê xwe rakir û li hemberî xwe nêri, min dit ku hevalekî me destê xwe ji me re dihejîne û gazi me dike.

Ez rabûm û bi lez gihiştîm menzela sînemayê, min ji heval re got: "Çi bû?" Heval bersiva min da û got:

"Di nûçeyan de dibêjin hevalên Zîndana Amedê agir bi qawîşan xistîne û neh heb girtî mirine û donzdeh heb ji birîndar in." Gava ku heval ji min re wisa got ez ji xwe re sekînîm û tiştîk ji devê min dînediket. Hevalên me yêñ din jî hatibûn menzelê.

Devê kî vedibû, digotin: "Çi bûye?" Lî di serê min de gelek tiştî diçûn û dihatin. Min ji xwe re digot, ma gelo heval din bûne, ma qawîşê dişewitînîn. Lî min bawer nedikir û min zanîbû ku dijmin êrisê bîriye ser hevalan. Ma ev 70 sal e we dîtiye ku televîzyonên dijmin rojekê nûçeyekê rast gotiye.

Saet derbas dibûn, em giş di menzelê de civiyane û serê me di ber me de û em kûr difikirin. Hevalekî me komanda di destê wî de kanal bi kanal li nûçeyan digeriya.

Me kîjan kanal vedikir, qala mirina



**RÊXISTINA** Efûyê ya Navneteweyî (AI) li dijî Tirkiyeyê dest bi kampanyayê kir. Kampanyayê roja 1'ê kewçerê bi civîneke çapemeniyê dest pê kir.

Di vê civînê de Sekreterê Gişî yê Rêxistina Efûyê Pierre Sane jî cih girt. Al'yê ji bo ku rê li ber bînpêkirina mafêni mirovan were girtin, ji dewleta tîr guhertîna madeya 8'an a zagona Anti-Terorî, kurtkîrîna maweya di binçav de hishtîna girtîyan û rakirina tecrîkirîna mirovan jî di nav de, 13 daxwaz kirin. Sekreterê Gişî yê Al'yê Pierre Sane ji bo sedema kampneyê jî wiha got: "Gotin û kirinê rayedarîn tîr ên li dijî hev bûn, sedema vê kampanyayê."



**LI GUNDÊ** Tilhanê yê Amedê çar mameste roja 1'ê kewçerê bi destê hêzên nedîyar ve hatin kuştin. Medyaya tîr kuştina mamos-teyan xist stûyê PKK'ê. Lî ji fermandarê ARGK'ê Cemil Bayık roja 2'ê daxuyanîyek da BBC'ye û da zanîn ku ew qetîfam bi destê gerîlî nehatîye kirin. Bayık got: "Hêzên kontrayî ji bo ku reaksiyonâ li dijî qetîfama Girtîgeha Amedê kêm hikin, ew qetîfam pêk anfîne, em vê qetîfam şermezâr dîkin."

Agaheyen 3 mameste yê ku hatine berdan jî şîkê dixe ser hêzên kontrayî. Li gorî agahîyan ji mameste yê ku hatîye kuştin yek jî endamê ÖDP'ê ye.

## NÛÇE

# 'Berpirsêñ rastîn ne li holê ne'

**Li gorî Av. Eren Keskin, ev bûyer ji derveyî**

**Wezareta Edaletê qewimiye, bi destê dewletê çêbûye.**

**Avûkat Keskin dibêje: "Em dibînin ku di nav 10 rojîn dawîn de nêzîkî 10 kes bi faîlî-meçhûlan hatin kuştin, piştî wê jî bûyerîn girtîgehan rûdan. Yanê ev bi temamî tewra dewletê ye, şerxwaziya wê nîşan dide."**

**P**êşî bi kuştina 10 girtîyan ên Girtîgeha Amedê ya Tîpa E, dû re xweşewitandina 3 girtîyan li Girtîgeha Bayrampaşayê, girtîgeh careke din ketin rojevê.

Wekî tê zanîn berî 2 mehan 12 girtî ji girtîgehan cur bi cur di rojiya mirinê de can dabûn, ji bo mafêni xwe yên însanî. Heta ku 12 girtîyan can da tu rîvebirîn dewletê xwe nelebitand û dewletê bi temamî guhêni xwe girtin ji dengê girtîyan re. Di dawîyê de Komîsyona Çavdêriyê ya Girtîgehan, ku di nav de Yaşar Ke-mal, Zülfü Livaneli, Ercan Kanar jî cih girtibûn, hate avakirin. Vê komîsyonê de nav rîvebirîn dewletê û girtîyan de navberî kir û rojiya mirinê bi qebûlkirina mafêni girtîyan xelas bû.

Amedê çar hevalîn me yê avûkat ku hin ji wan rîvebirîn Baroyê ne jî, beriya me bi 15-20 deqîqeyan ketin girtîgeh. Piştî wan em çûn, lê mixabin me nekarî em destûrê bistînin. Li wê derê me nekarî bi rîvebirîn girtîgehê re têkiliyê deyinin. 2 kesen sivil bi me re peyivîn. Ew her du kes wekî ku xwe ji êrîskirinê re hazir kiribin bi awayekî çors bi me re dipeyivîn. Bi mazeretên eletewş nehiştin ku em girtîyan bibînin. Lî di dawîyê de bi agahîyan wan hevalîn avûkat ku ketibûn hundir, rastiya bûyerî derket holê."

Li gorî Av. Eren Keskin, ev bûyer ji derveyî Wezareta Edaletê qewimiye, bi destê dewletê çêbûye. Avûkat Keskin dibêje: "Di demen dawîn de cinayetên faîlî-meçhûl sekimîn. Lî em dibînin ku di nav 10 rojîn dawîn de nêzîkî 10 kes bi faîlî-meçhûlan hatin kuştin, piştî wê jî bûyerîn girtîgehan rûdan. Yanê ev bi temamî tewra dewletê ye, şerxwaziya wê nîşan dide. Li gorî min jixwe tu râyeaya Wezareta Edaletê tune. Berpirsêñ ku têx xuyan, ew ne berpirsêñ rastîn in. Berpirsêñ rastîn ewen ku ne li holê ne. Ev bûyer bi biryara dewletê qewimî û tiştekî enteresan e ku bûyer roja ku Demirel jî li Amedê bû qewimî... Tiştekî din jî heye: Dema em ji girtîgehê derke-tin, ew du kesen sivil ku di girtîgehê de bi me re mûhabat bûbûn, bi erebeyeke spî (renault) her tim li dû me bûn, em di-hatin takîpkin. Ev jî nîşan dide ku kî xwedî gotin û berpirs e."

### Çar kes agir berdan canê xwe

Ji bo protestokirina qetîkirina girtîyan Girtîgehê Amedê, di demen dawîn de 24 kesen ku li Kurdistânî hatibûn kuştin, binçavkirina însanan û dangirtîna Med-TV'ye pêşî girtîyeke bi navê Gülbahar Köker 27'ê rezberê, dû re 2 girtî bi navê Hamdullah Şengüler û Vedat Aydemir roja 28'ê rezberê di Girtîgeha Bayrampaşayê de agir berdan canê xwe û xwe şewitandin.

Av. Eren Keskin a ku di nav vê komîsyonê de ye, der heqê çûyina wan a Amedê de ev agahî dan me: "Ji Baroya



Av. Eren Keskin

tedawiya Gülbahar Köker li girtîgehê tê kirin, Hamdullah Şengüler û Vedat Aydemir jî di Nexweşaneya Cerrahpaşayê de radîzen. Av. Filiz Köstak ku çûbû herdu girtî li nexweşaneyê ziyaret kiri-bû, got ku siheta girtîyan zêde ne baş e. Teví rûyê wan hemû laşê wan şewitiye. Laşê wan wisa werimiye ku mirov bi zorê wan nas dike. Rewşa wan zehf cidiye. Herdu girtî ji Köstak re gotine ku: "Morala me zehf baş e. Diviyabû ku em reaksiyonâ xwe li hemberî qetîfama Girtîgeha Amedê û neheqîyen ku li hemberî gelê me têx kirin, nîşan bidin. Li gorî me reaksiyonâ herî mezin şehadeta me bû. Lî belê hevalîn me mudaxaleyî me kirin. Eger em ji vir derkevin, careke din em dixwazin ku herin ba hevalîn xwe. Televîzyona Inter-Star em bi awayekî itirafkar nîşan dane, ev tiştekî ne rast e. Emê mafê xwe yê qanûni li hemberî Inter-Starî bi kar bînîn."

1'ê Kewçerê jî girtîyeke bi navê Yakup Güneş jî bo protestokirina bûyerîn dawî di Girtîgeha Batmanê de xwe şewitand. Tedawiya Yakup Güneş li girtîgeh tê kirin.

Li hemberî van bûyerîn dawîn li Stenbolê li Meydana Sultanahmetê nê-

zîkî 700 kesî der heqê Serdozgerê Komarê ya Amedê, Dozgerê Girtîgehê û Wezîr Edaletê Şevket Kazan de, li En-qereyê jî 50 kes der heqê Kazan, Ağar, Waliyê OHAL'ê Necati Bilican û Dozger û rîvebirîn Girtîgeha Amedê de gi-liya sûcdariyê kirin.

Piştî bûyerâ Girtîgeha Amedê Şevket Kazan diyar kiribû ku wî sê rîvebirîn girtîgehê ji kar bi dûr xistine. Lî li gorî agahîyan girtîyan, Midûr Aziz Gürer û sûbayek berpirsê ji ewlehiya derve hê jî li ser kar in. Girtîyan daxuyandin ku saziyên navneteweyî û Komîtyea Çavdêriyê ya Girtîgehan divê li ser vê yekê bisekinin. Girtîyan girtîgehan careke din ketin greva birçibûna tîmî û listeya daxwazîn xwe ku di 15 madeyan de berhev kirine, daxuyandin.

Li Girtîgeha Çanakkaleyê jî ji 30'ê rezberê û vir ve rewş her diçe xerabtir dibe. Li gorî agahîyan, gardiyan bi sîven hesinî li nav girtîyan digerin û di her kîlîkê de dibe ku bûyereke mezin biqewime. Rojnamevan û avûkat nikarin bikevin nava girtîgehê û girtîyan bibînin.

AYNUR BOZKURT

*Parêzgarê Dihokê Abdulezîz Teyîb:*

# **PKK hêzeke bakurî ye**

**Parêzgarê (Waliyê) Dihokê**

**Abdulezîz Teyîb got ku wan**

**ji Neteweyên Yekbûyî (NY) re**

**eşkere kiriye ku YNK**

**digel Îranê hevkarî dike,**

**lê NY bêdeng maye, li ser vê yekê**

**alîkarî ji Saddam xwestine.**

**Teyîb der barê PKK'ê de jî ev got:**

**"Têkiliyên me digel PKK'ê wekî heval,**

**wekî dost dimeşin, tu pirsgirêk**

**di navbera me û wan de nîn e.**

**Gelek caran danûstandin**

**di navbera me û wan de çêbûye.**

**Em wan wekî hêzeke şoreşger**

**a herêma Bakur dibînin."**

**H**ün dikarin ji me re, ji rewşa Başûr û derketina YNK'ê ya ji axa Başûr, behs bikin?

● Rewşa berê geleki xerab bû, ne bi dilê me û ne bi dilê gelê kurd bû. Ci aliyê derve û ci jî ji aliyê hundir ve. Ev tiştên ku me dixwest pêk bînin, pêk nedihatîn. Me dixwest sistemeke demokratik pêk bînin da ku hemû partiyên Kurdistanî û Iraqî tê de cih bigirin.

Ew sisteme berê ya bi rengê fifty-fifty ne demokratik bû, bi rê ve jî nedîçû. Gelek caran me ji aliyê dinê (YNK) xwest ku careke din hilbijartın çêbibe, lê belê ew li dijî vê yekê bûn. Ji ber ku wan jî dizanî ku nikarin bi ser bikevin, lewre ew daxwaz nedipejirand.

Li aliyê din YNK'ê roj bi roj xwe nêzîkî Îranê dikir û ji wê dewletê çek û alîkarî werdigirtin. Li aliyê din beramberî vê alîkariyê rê dida hêzên Îranê ku wezin herêma Başûr û êrisî hêzên dijberên xwe bikin. Ev hemû tişt diyar bûn ji raya giştî re. Me ev plana YNK'ê li nik Neteweyên Yekbûyî eşkere kir, lê belê wan li hemberî vê yekê tiştek nekir. Em naçar man wê wextê, doza yarmetiyê ji rejîma Saddam bikin, ji têkbirina vê plana YNK'ê ya digel Îranê.

Niha jî, piştî ku herêm kete bin destê me, em dixwazin sistemeke demokratik û nû digel hemû partiyên Kurdistanî û Iraqî pêk bînin û careke din Parlementoya Herêma Kurdistanê karê xwe bimeşîne.

*Hevkariya we ya digel Saddam bi ci rengî bû, hûn ji Saddam ci dixwazin?*

● Tu danûstandin di navbera me û Saddam de çênebû, bi tenê yarmetî da me. Heta di navbera me û rejîma Saddam de civînek çênebûye. Ne digel vê dewletê belki digel hemû dewletên herêmê, tu danûstandin me çênebûne.

Xwestina vê yarmetiyê ji rejîma Saddam, piştî bersivnedana Neteweyên Yekbûyî pêk hat. Lê belê piştî vê daxwazê tu rûniştin bi Saddam re çênebû. Haya hemû partiyên kurdi ji vê danûstandinê hebû. Dibe ku Saddam careke din hêzên xwe bişîne herêmê, lê wê demê emê li hemberî wî rawestin.

*Hûn wekî PDK, rewşa Rojhilata Navîn bi giştî û rewşa Kurdistanê bi taybetî çawa dinirxînî?*

● Em wekî parti nikarin bi serê xwe, kêşeyên herêmê çareser bikin. Lê belê li ser rewşa dawîn a Kurdistanê û daxwazên dewletên herêmê, ez dikarim vê



Parêzgarê Dihokê Abdulezîz Teyîb

bibêjim, bi taybetî Türkiye dixwaze plana "Piştêna parastinê" (xeta ewlehiyê) çêbike, em li dijî vê planêne. Em naxwazin careke din herêma Kurdistanâ Başûr wekî herêmeke serbazî (leşkerî) were bikaranîn. Heta bikarin emê bi çalakiyên siyasi û diplomatik li dijî vê planê rawestin.

*Peywendiyên we yên digel partiyên din çawa dimeşin?*

● Min berê got, me ji hemû partiyên Kurdistanê xwestiye ku em bi hev re karê parlementoya nû bimesin. Bi taybetî (tenanet) ji YNK'ê jî xwestiye ku careke din vegere Kurdistanê û endamên xwe bişîne parlementoyê.

*Peywendiyên we digel PKK'ê çawa ne?*

● Wekî stratejiveke ayendeya dûr, di nav planen hemû kurdan de, her wîse di nav planen PDK'ê de jî têkiliyên me digel PKK'ê wekî heval, wekî dost

dimeşin, tu pirsgirêk di navbera me û wan de nîn e. Gelek caran danûstandin di navbera me û wan de çêbûye. Em wan wekî hêzeke şoreşger a herêma Bakur dibînin. Em hêvî dikin ku ew problemen xwe yên bi dewleta tirk re bi riyên aştiyane çareser bikin. Tenanet, eger ji me alîkariya navbertiyê bixwazin di navbera xwe û dewleta tirk de, em ji bo vî karî amade ne. Em tu car naxwazin careke din di navbera me û wan de şer derkeve, eger ew têkilî karêne me yên hundîrin nebin.

*Hûn rola Amerikayê ya ku li ser Kurdistanê dilize çawa dibînin?*

● Niha ev problema me ye, çimkî heta niha me nedizanî çiqas dewleten rojavayî û Amerika yarmetiyâ me dikin, heta niha jî ev yek zelal nebûye. Ji ber vê yekê jî me nekarî piştî bi wan ve bibestinîn (girê bidin). Dibe ku hin plan û tevdîren wan hebin, lê em pê nizanin.

**HEVPEYVİN: DILÊR**

# Dahûrîna peyvan (5)

**Şevîrk: Peyv hevedudanî ye, ji sê hêmanan çêbûye û her wiha di awayekî xerabûyi de ye.**

**Peyv ji van hêmanan çêbûye;**

**"şev", "buhêr" û "k".**

**"Şev" navdêr,**

**"buhêr" raweya**

**fermanî ya lêkera**

**buhartînê û "k" ji**

**parkit e. Çendî kesen**

**me yên ku vê peyva**

**hevedudanî rast**

**bi lêv dîkin jî hene,**

**yên ku nakin jî pir in.**

**Mîna devera Farqînê**

**ku vê peyvê wekî**

**şevîrk bi kar tîne.**

**M**in di çar nivîsên xwe yên berê de peyvin dahûrandin (tehlîl kîrin), lê bi awayekî di ser re. Ez zêde neketim kîtekîtên (detayê) wan. Bi mebesta ku kesen eleqedar, nemaze xwendevan bi hêsanî jê fêm bikin.

Di vê nivîsê de jî ez dê lê bixebitîm ku çend peyvîn din jî dahûrînim û wan şirove bikim.

**Cok:** Ev peyva hanê, hevedudanî ye û ji aliye awa ve xerabûyi ye. Ji du hêmanan (ûnsûran) hatiye pê; ji "cih" û "ok"ê; "cih" a li virê navdêr e û di wateya erxa avê de ye, "ok" jî parkit (paşgir) e.

**Peyva "cok"ê** bi taybeti li devera Mêrdinê tê bikaranîn û di şûna ciha avê de ye. Bes, peyv kêm tê bilêvkirin, di şûna "cihok"ê de "cok"ê bi kar tînin û bi ya min cihok biçuktir e ji cihê, yanê ciha avê.

**Pêçî:** Peyv hevedudanî ye û ew jî, ji hêla teşe û awa ve xera bûye. Li gelek deveoran ev peyva hanê di cihê "tilî" yê de tê bikaranîn. Eger em peyvî ji hev bikin; "pênc" û "ik".

Xwes eşkere dibe ku peyv ji navdêr û parkîtekê çêbûye. Bi qonaxa demê re peyv li "pêçî" yê dageriyaye. İro jî gelek kes "pênc" wekî "pêçî" bi lêv dîkin. Wusa xuya dibe ku bi awayekî pir hêsan "n" û "c" ya di peyva "pênc" de ketiye. Ji aliye din ve "k" ya di parkita "ik" û de jî ketiye û peyv wekî "pêçî" maye. Em baş dizanîn ku tipen

"i" û "T" jî cih didine hev û din. Nimûne: Dayîk û dayik, nêzîk û nêzîk....

Ji bo ku em mijarê hîn bêhtir roni bikin, em pêwistî bi dayina nimûneyekê jî dibîn. Melêv an jî melhêv, haceteke çandiniyê ye û pênc tiliyên wê hene. Di nav gel de jî wan pênc tiliyên wê re "pêçî" û "pênc" jî tîn gotin. Peyv ji "pênc" ê hatiye û bûye "pêçî".

**Şiyar:** Ev peyv ji du hêmanan, yanê ji du parçeyan pêk hatiye; ji "hiş" û "yar" ê. Hiş, di şûna hest, di şûna şîfura erebî de ye; yar jî parkit e û erk û vatiniya parkitên "dar" û "mend" ê tîne cih, yanê xwedîtiyê dide nîşan.

Awayê rast ê peyvî "hişyar" e, lê ew ji bi qonaxa demê re li "şiyar" ê dageriyaye.

**Şevîrk:** Peyv hevedudanî ye, ji sê hêmanan çêbûye û her wiha di awayekî xerabûyi de ye. Peyv ji van hêmanan çêbûye; "şev", "buhêr" û "k". "Şev" navdêr, "buhêr" raweya fermanî ya lêkera buhartînê û "k" jî parkit e. Çendî kesen me yên ku vê peyva hevedudanî rast bi lêv dîkin jî hene, yên ku nakin jî pir in. Mîna devera Farqînê ku vê peyvê wekî şevîrk bi kar tîne.

**Nazbalîsk:** Ji çar parçeyan hatiye pê û di rewseke xerabûyi de ye. Heke em peyva xwe ya hevedudanî ji hev bikin em dê bibîn ku ew jî "naz", "bal", "geh" û "k" yê çêbûye.

Peyva "balîf" an jî "balgî" yê ji aliye şe-

we ve di kurdî de ji hev cuda tê bilêvkirin, wekî ku soran dibêjin "palpiş" û kirmanc (zaza) jî dibêjin "bâlişna", kurmanc bi xwe jî, ji hev cihê bi lêv dîkin. Mîna balîf, balgî û balgîv...s

Bi iştimateke mezin peyv ji "pal" û "geh" ê hatiye pê. Çawa em pê dizanîn tipen "b" û "p" yê bi hev diguherin, ji ber ku jêderka wan yek e û tipen lêvi ne. Li aliye dinê dibe ku bê pirsin içar tipen "I" û "e" çawa bi hev guherine?

Tipen me yên dengdêr (yên bideng) mîna "e", "ê", "i" û "T" yê digel yên din jî bi hev diguherin. Nimûne:

ji bo "e" û "i" yê; felitîn û filitîn

ji bo "e" û "ê" yê; mejî û mêjî

ji bo "ê" û "T" yê; şérîn û şîrîn

ji bo "i" û "T" yê; Kurdistan û Kurdistan ûcar "naz" a di "nazbalîsk" ê de navdêr û "k" ya wê jî parkit e.

Ligel vê yekê, deveren ku nazbalîskê wekî "navbalîş" jî bi kar tînin hene. Wekî encam, em dikarin bibêjin ku rastiya peyvê palgeh be ew jî bi qonaxa demê re li şeweyen din ên ku li jorê destnîşan kir, dageriyabe.

"Nazbalîsk" ew balîfa nexşkirî û biçûk e ku bi taybeti ji bo mîvanan tê bikaranîn.

ZANA FARQÎNÎ

## 'Xwîna we şûrê me qirêj kir!..'

A. MELİK FIRAT



**H**efteya ku derbas bû li DGM'ya Stenbolê mehkemeya min hebû. Sawciyê (dozger) ku der heqê min de doz vekiriye, idia kiriye ku min di axaftina xwe de (li NCM'ê) ji bo meclisê "Bêşeref e, aşbatel e" gotiye. Yanê min heqaret li şexsiyeta meclisê kiriye.

Ez cûm, min ji wan re wiha got:

Ez li Yalovayê rûdinim û ji ber ku hinek nerehetiyen min hene, (ez) nedihatim. Lê ez bi taybeti hatim û dixwazim bi wî sawciyê ku doz vekiriye re muşerref bibim, hem teqdîren xwe û hem jî teessûfîn xwe teqdîm wî bikim. Ev cil sal e ku ez di nav siyasetê de me û sê caran hinekan parlamento wergerandine, reisecumhûr, serokwezîr, wezîr û mebûs gitine, avetîne hepsan, qelebend kirine. Mixabin ku tu sawciyekî der heqê wan kesan de, doz venekiriye. Tîrsiyane. Dêmek ev sawcî xwedî heysiyet e ku yek heqaretê li meclisê bike, der heqê wî de dozê vedike. Şerefa meclisê diparêze... Ez wî teqdîr dikim.

Lê der heqê wan zalimên ku meclisê bi darê zorê werdigerînin, endamên meclisê bi temamî digirin, qelebend dikin de ku dozê venake jî, ez teessûfîn xwe teqdîm dikim. İro Kenan Evren li Marmarisê kîf û sefa dike û kes nikare

jê re bibêje siya te xwar e! Yanê yên ku kîlt li ser deriyê meclisê dixin, mebûsan digirin, hepîs dîkin; ji wan re li çepikan dixin...

İca yekî mîna min ku cil sal e di siyasetê de tim medxûr û mezlûm e, dema ji bo demokrasîyê, ji bo aşîf û selametiya wî welatî du kelîmeyan bibêje, derhal der heqê wî de dozê vedikin...

Ez dibêjim bila meclis serdest be. Li gorî 'Qanûna bingehîn' jî lazim e ku meclis li raserî hemû saziyan be. Heta vê gavê li wî welatî sivilan tu carî qanûna bengehîn çenekirine. Gişan leşker çedîkin. Ewil darbeyê çedîkin (Bi zimanê frensi budeta, ereb dibêjin teqlîb hikûmet û tirk jî dibêjin darbe) pişt re jî qanûna bingehîn çedîkin. Lê di gel vê yekê, ev qanûna bingehîn jî dibêje, quweta herî mezin û serdest meclis e.

Lê yên ku gerek e di bin emrê meclisê de bin; mîna leşker û buroktran, bi dewlemendan re rûdinin û geraran ew didin. Kengê kîfa wan bixwaze, dest daşîn ser meclisê jî... Û çapemeniye... Çapemeniye wan, kasîstî darbeciyan e. Ehlî çapemeniye mîna goreş in. Ew goreşen ku li dora şeran digerin, da ku şer tîşekî biku-jin, ew jî jê istifade bikin.

Min ji wan re got, du roj berê de televîzyonê de serokê meclisê yê berê Hüsâmettin Cindoruk bi Mehmet Barlas û profesorekî re sêçar saetan li ser rewşa meclisê axaftin. Cindoruk jî bi ekere digot:

"Li welatê me parti hene, lê demokrasî tune."

Cil sal e ku ez di nav siyasetê de me û ji ber ku ez tim dibêjim, bila zîlm tunebe, bila derew ji ortê rabin, bila demokrasî hebe, ji aliye zali-

man ve tim tême girtin. Saziyeke ku xelkî bi şekî jî temsîl bike, em lê heqaretê nakin. Em dibêjin wezifeya meclisê ji destê wê girtine, ew kirine mîna noter, mîna mubaşîr. Ü em dixwazin ku meclis şerefa xwe biparêze... Sawcî jî dibêje te heqaret li şexsiyeta meclisê kiriye. Hûn dibînîn ku ev sawcî ci mîrxas e!.. Mirovî ku tim ew xistine hepsan, lê dane, serê wî şikandin e; wî dike xadir (fail), lê di rastiya xwe de ew medxûr e, mezlûm e. Sawcî rol guhertiye. Jîxwe elametê farîqa vê sistemî jî ev e: Serê insanan dişkîne, xwîna wan dirêje, wan dikuje û pişt re jî ji malbata wan diyetê distîne. Xwe medxûr û mezlûm dide nîşan... mirov dikuje, dibêje quşûra te bû, te belasebeb ez westandim! Min şûr hejand, ez westiyam û te bi xwîna xwe, şûrê min qirêj kir!.. Ü pereyê paqîkirina şûrê xwe ji malbata kuşîyan distîn... Şûrê wan jî gelek biha tê şûştin! Mal û milkê mirov tev distîn...

Heyeta mehkemeyê ji mirovîn baş xuya dibûn. Sawciyê ku besdarî mehkemeyê bû, wî jî "Ev fikrek e, qenaetek e, mûcîbê cezayê nîn e" got û beraeta min xwest. Hakim jî qerara beraeta me da.

Lê hîn gelek mehkemeyen min hene...

Yanê tu ci dibêjî bibêje, bêfeyde ye. Mîjetek heye, welatek heye; dema tu navê kurd û Kurdistanê telafûz bikî, temam... Tu dixwazî welat ji hev parçê bikî!.. Tu yekîtiyê dixwazî, tu aşî, tu biratiyê dixwazî? Kes guh nade te...

Ü bi vî awayî jî, ev zâlim vî welatî wêran dîkin, mîletê tirk jî, mîletê kurd jî perîşan dîkin... Lê em jî xwe şûn ve nadîn. Qenaeta me ya ilmî, ya dînî ci be, emê bibêjin. Emê gotina rastiyê bînîn ziman, heyâ ku nefesa me çiki...

# Dixwazin Dêrsimê vala bikin

**Li gorî gotina malbata Mansuroğlu, hin kesan sê gerila îxbar kirine, ji wan du heb hatine girtin û di cih de hatine kuştin, lê hêzên dewletê yekî bi navê Yusuf Karanlık bi dest nexistine, li ser vê yekê hatine Mazlum Mansuroğlu girtine û li cihekî din kuştine. Cendekê du kesen ku pêşî hatine kuştin û cendekê Mazlum Mansuroğlu gelekî ji hev dûr in.**

**L**i ser banga gelê Dêrsimê serok û nûnerên çend saziyên demokratik digel çend kesen rewşenbir û demokratik heyetek dameziran din ji bo ku herin rewşa gel bibînin û paşê bi raporekê vê rewşê ragihîmin raya giştî. Heyet roja 11'ê rezberê ji Stenbolê bi balafirê çûn Meletiyê, dû re jî bi erebeyan ketin riya Xarpitê.

Kesen ku di nava vê heyetê de cih girtin ev bûn: Salman Yeşilgöz (Serokê Komeleya Hevgiriyê ya Dêrsimiyan), A. Rıza Aydin (parêzer), Ercan Kanar (Serokê İHD'ya Stenbolê), Ferhat Tunç (hunermed), Aynur Evliyaoğlu (parêzer), Koray Düzgören (rojnamevan), Celal Başlangıç (rojnamevan), Fuat Bulut (rojnamevan), Nurettin Baykan (rojnamevan), Tayfun İşçi (KESK), Murat Güler (Mazlum-De Cafer Demirer (ji İHD'ya Xarpitê).

Me ji Serokê Komeleya Hevgiriyê ya Dêrsimiyan Salman Yeşilgöz, der barê gerê de agahî standin.

Dema ku heyet digihîje sînorê Xarpitê, hêzên dewletê wan didin rawestin û nasnameyên hemûyan tê kontrolkîrin. Dema ku digihîjin Xarpitê, diçin Eğitim-Senê. Li ~~Yânya~~ Eğitim-Senê bi endamên İHD, hin malbatênu ku di sala 1994'an de ji Dêrsimê koç kirine û hin malbatênu ku ji navçeyên Xarpitê koçber bûne re hevdîtin pêk tînin. Di vê hevdîtinê de malbateke ku ji Mêrdinê koç kirî ji hebûye.

Li gorî agahîya heyetê, ev malbat serê sibê hatine, li cihêku wê heyet we're kom bûne, di nav xwe de civîn çêkîrine û kesen ku wê bi heyetê re biaxive niqandine. Kesen ji heyetê dibêjî:

"Digel evqas zilm û zoriyê birêxistinbûna gel hêjayî pesnê ye."

Li wê derê stranbêj Ferhat Tunç re-sitaleke biçük dide malbatan. Heyet wê şevê li wir derbas dike, bi banga sibê rî (saet di 7'an de) heyet dikeve riya Dêrsimê. Cara yekemîn li ber Pira Gulişkûrê hêzên dewletê heyetê didin rawestandin, lê bêyi tu astengî û kontrolkîri na nasnameyan, rî didin heyetê.

Li ser Pira Seyidan (Seyitli) heyet careke din tê rawestandin, hêzên dewletê nasnameyên hemû kesan berhev dikin, li gorî du defteran nasnameyên kesen di nava heyetê de kontrol dikin. Di defterekê de navên kesen ku li wan tê gerîn heye, deftera duyemîn ji wekî raporekê bûye, agahîyen mîna 'kî ji ku tê û diçe ku derê û çiqasî li ku derê dimîne' tê de têne qeydkirin. Bi riya vê raporê tevgerên gel tê kontrolkîrin.

Piştî kontroleke sivik a li ser Pira

Mêzgîrê, heyet digihîje Sêxangê, li wê derê kontroleke xurt pêk tê, di wê kontrolê de hemû hêzên dewletê (lesker, polis û tîmîn taybet) cih digirin. Sê setan heyetê li wir dihêlin bi hinceta ku wê ji walî destûra ketina bajêr bistin. Li Xarpitê 6 kesen sivîl jî li erebeya ku heyet pê tê siwar bûne, lê hêzên dewletê wan kesen sivîl ji erebeyen heyetê tînin xwarê û bi erebeyen din dişinin. Her wiha li vê derê endamên heyetê yek bi yek bi du kamerayan têni kişandin kamerayê. Hinek endamên heyetê dixwazin derdorê xwe bikişînin kamerayê, lê hêzên dewletê nehiştine ku li herêmê tu dîmenan bikişînin. Piştî vê kontrolê di du-sê kontrolê din re derbas dibin û paşê dikevin bajêr.

Ketina bajêr jî wisa bi hêsanî çênamebe, ji vî cihê kontrolê heta dikevin nava bajêr 4 saet derbas dibin. Di rewşekê asayıf de navbera Dêrsim û Xarpitê herî zehf saet û nîvekê dikişne. Hêzên dewletê tevî wan heta ku otelê (Tepebaşı Oteli) diçin û ji heyetê programa gerê dixwazin. Lê heyet dide zanîn ku tu programa wê ya diyarkirî nîn e, ew dixwazin bi hemû kesan re hevdîtinê çêbikin. Heyet saet di 11:30'an de berî nîvro digihîje otelê, piştî re ji diçe cihêku wê bi platforma Sendikayan re hevdîtinê çêbikin.

Li bajêr hevdîtina yekemîn bi Platforma Sendikayan re çêdibe. Dema heyet bi sendikavan re dikeve civînê, polis jî dixwazin bikevin hundir, heyet li dijî vê yekê radibe, polis dihêlin di-



Salman Yeşilgöz

çin, lê paşê vedigerin derî pehin dikin. Piştî civînê, di saet 12:30'an de heyet diçe ba walî, bi walî re hevdîtinê çêdike; heyet ji walî hin pirsan dike, ev pirs bi giştî li ser van mijaran in:

Ambargo ya li ser gel; aşen girtî, ri-yen girtî; kuştina Mazlum Mansuroğlu; rewşa 60 hezar sewal, 500 kesen li Zozanê Melenê ya Erzinganê. Ew kes li zozan mahsûr mane, ji ber ku hêzên dewletê rî nadîn da ku ew vegeerin warê xwe; cerdîn li ser navenda bajêr û pêkutiyêni li ser sendikayan.

Ev hevdîtin saet û nîvekê didome, lê walî dibêjî:

"Agahîyen di destê we de ne rast in. Ji tiştî ku hûn dibêjîn bi tenê kontrola li ser kinc û xwarinê heye, di vî warî de ji em serkeftî ne, fermana vê kontrolê min bi xwe daye û bandoreke wê ya baş çêbûye. PKK'ê du belavok derxistîne li ser vê mijarê, ji wan belavokan diyar dibe ku ev kontrol, wê geleki tengav dike."



Heyet li Plezîze bi Dêrsimiyan re hevdîtinê li İHD'ê pêk anî

Walî bi xwe dipejirine ku hinek aş hatine girtin, lê dewlet disa jî baca xwe ji xwedîyê aşan distîne. Li ser rewşa kesen li zozanê Melenê jî, walî dibêjî ku ew herêm cihê operasyonan e, lew-re jî ew rî nadîn ku koçer di çiyan re derbas bibin, bi tenê ew dikarin bi kamyonan vegeerin. Heyet dixwaze ku dewlet ji wan kesan re kamyonan temîn bi ke, lê walî xwe nade ber vê yekê.

## Milisên li leskeriyê jî hene

Li gorî waliyê Dêrsimê Mazlum Mansuroğlu milisê rêxistinê (PKK) ye û li ser îxbarekê ew hatiye girtin û itraf-karek jî milisbûna wî tesdiq kiriye. Li ser gotina endamên heyetê ya bi rengê: "Ew hê berî sê mehan leşker bû, çawa bû milis?" Walî dibêjî:

"Ev ne pîvan e, hin kes hene li leskeriyê ne, lê disa jî milis in."

Li gorî gotina malbata Mansuroğlu, hin kesan sê gerila îxbar kirine, ji wan du heb hatine girtin û di cih de hatine kuştin, lê hêzên dewletê yekî bi navê Yusuf Karanlık bi dest nexistine, li ser vê yekê hatine Mazlum Mansuroğlu girtine û li cihekî din kuştine. Cendekê du kesen ku pêşî hatine kuştin û cendekê Mazlum Mansuroğlu gelekî ji hev dûr in. Heyet dixwaze here cihê bûyêrê, lê walî destûrê nade, walî pêşî destûra heyetê dide ku bikevin Mêzgîrê, heyet pêşî naxwaze, paşê dixwaze here wê navçeyê, içar walî wê derê jî wekî cihê operasyonê bi nav dike û destûra çûna wê derê jî nade. Di encamê de na-hêlin ku heyet here derekê.

Heyet hin hevdîtinan bi gel re pêk tîne, kesen ku pê re hevdîtinê dikin, ji hêla hêzên dewletê ve têni pirsiyarkirin. Li gorî çavdêriyê heyetê li Nexweşaneya Dêrsimê bijîşkî tenê maye, ev ji serekbijîşk (sertabîb) e. Ji ber ambargo ya li ser dermanan, li vê dcîre kes nikare tedawî bibe. Li gorî gotina gel, hêzên dewletê di destpêkê de xwestine zarakan hînî balîkişandinê bikin û fu-hûşê li nav gel belav bikin, lê li hembe-ri reaksiyona gel bi ser neketine.

Tê gotin ku ne tenê li gund û navçeyan her wiha li navenda bajêr ambargo heye, dora taxan bi têlîn seradî hatiye girtin, li ser rîyan cihê kontrolê hatine avakirin. Li derdorê bajêr mewziyên hêzên dewletê û kamerayen termal he-ne, di bûyereke biçük de hêzên dewletê bajêr gulebaran dikin. Li gorî çavdêriyê heyetê dewlet di nava hewldana valakirina bajêr de ye, sedema evqas pêkutiyân jî ev e. Li bajêr piştî saet 7'ê êvarê kes li derve namîne. Ev gotina endamekî heyetê rewşa bajêr xweş dide zanîn:

"Dema em ji Dêrsimê çûn Amedê, bi min werê hat ku ez ji girtigehê derketime û çûme cihekî azad."



● 5.10.1962: Rojnameya mehane DICLE-FIRAT dest bi weşanê kir. Xwedî û berpirsê rojnameyê Edip Karahan bû. Rojnameyê, bi kurdfî tê tirkî weşan kiriye, ji ber ku nivîsên kurdfî tê de hatine weşandin, berpirsê rojnameyê Edip Karahan hatîye girtin. Wekî tê zanîn Edip Karahan tevî kesen di bûyera 23'an de jî hatîye girtin.

Nivîskarê ku di rojnameyê de nivîsinê jî ev kes bûne: Musa Anter (Şehmus Elmas), Sait Kirmizitopark (Dr. Şivan), Halit Nizami Balkaş, Ahmet Batanî, Yaşar Kaya, Isa Şans.

Rojname bi piranfî li ser pirsgîrêkên kurdan sekintye.

● 7.10 - 17.11.1927: Serhildana Qoçuşağı û li dîjî wê hereketa

komara tirk.

● 8.10-14.11.1980: Serhildana Pilêmoriyê û hereketa komara tirk.

● 12.10.1998: Osman Sebri li Şamê çû ser dilovanîya xwe. Osman Sebri, di sala 1905'an de li nahiyeye Narîncê ya bajarê Semsûrê hatîye dînyayê. Plîşî serhildana Şêx Seid, derbasî Başûrê Biçûk dibe.

Li her çar parçeyê Kurdistanê dîgere, 18 caran tê girtin û bi salan di girtîgehan de dimîne.

Di Hawar, Roja Nû û Ronahî de dixebite û nivîsên wî têne weşandin. Di Rêxistina Xoybûnê de cih digire, dixwaze tevî Serhildana Agîrîye bibe, lê tê girtin. Çar berhemên wî yê çapkirf hene.

## AWIR

### Welatparêzekî berxwedêr bû

## Osman Sebri



**H**in berhem û kes hene ku zû têne jibîrkirin û xwe bi xwe ji holê radibin, lê hin berhem û kes jî hene tu caran nayêne jibîrkirin û bi qonaxa demê re buha û rûmesta wan zêdetir dibe û bêhempa dibin. Apo, yanê Osman Sebri aha ji wan kesan e ku tu car ji bîr nabe.

Osman Sebri jiyanekê birûmet jiyaneye, berhemên birûmet afirandine, servanî kiriye; bi dehan caran hatîye girtin, hatîye sîrgûnkirin. Di nava gelek rêxistinan de cih girtiye. Ew tim ji bo kurdan û serfiraziya kurdan jiyaneye, ne ji bo şexsê xwe, her wisa wî ji bo mirovâhiyê xebat kiriye.

Li Iraqê demekê ku wî didarizînin jê dipirsin:

"Tu misilman i?" Dibêje: "Na. Ez berê insan im, paşê kurd im, paşê jî misilman im."

Apo li hemberî her neyîniyê dengê xwe bilind kiriye, bêtirs fîkrê xwe gotine, der barê axatiyê heta bi adetên kurdan ên çewt û paşverû de. Nexwestiye ku gelê kurd baweriya xwe bi tu kesi û tu dewletê bîne, bi tenê daxwaza yekîtiyê ji wan kiriye. Ew wekî efsaneyekê jiyaneye, mirov dikare bibêje hê jî dîji, ew di berhemên xwe de, bi serbilindîya xwe, bi têkoşeriya xwe her dîji.

Apo, di sala 1905'an de li gundê Semsûrê Narîncê hatîye dînyayê, hê biçûk bûye bavê wî miriye. Ji malbateke dewlemed û eşireke mezin tê. Pişî Serhildana Şêx Seid derbasî Başûrê Biçûk dibe, pir caran li wê tê girtin û tê sîrgûnkirin. Dixwaze besdarî şerê Çiyayê Agîrîye bibe, lê tê girtin. Diç Başûr li Mûsilî û li Bexdayê tê girtin, wî sîrgûn Urđinê diken.

Di Rêxistina Xoybûnê de kar dike, Partiya Demokrat a Kurdan li Başûrê

Biçûk ava dike, di avakirina Enstituya Kurdi ya Parîsê de cih digire. Di Hawar, Ronahî û Roja Nû de pir nivîs û helbes-tê wî têne weşandin. Berhemên wî yêni bi nav û deng jî ev in: "Dîwana helbestê bi navê "Apo", dîsa dîwana helbestê "Bahoz û çend nivîsîn din", pirtûka li ser ziman bi navê "Derdê me" û "Çar lê-heng".

Apo pir bal kişandiye ser şexsiyeta kurd, dixwaze ku kurd bibe xwedî şexsiyet, nebe xayîn û nebe xulamê xelkê. Li ser vê yekê pir nivîs û şîr nivîsandîne, yek ji wan jî "Ker û Azadî" ye. Li çend rîzân di vê helbestê de binîhîrin ku Apo ji kesen ku naxwazin bibine xwedî şexsiyet re çawa gotiye:

*Ji bo azadî nefel û giya  
Nexwest gund berde, derkeve ciya  
Digot: Ez naşem bijîm bêhevvar  
Béaxur nabim dema bû hévar  
Azadî ci ye di gel tîrsa can?  
Gava bihîstîn kûvî ev xeber  
Gotin: Rast e, aza nabin ker*

Apo pişî re wiha diaxive: "Ica hinekîn me wek kerê qîma xwe bi haran anîne, naxwazin azadiyê, dixwazin axurê wî hebe, hevsarê wî hebe, qeyd-merbenda wî hebe heyâ gur wî nexwin."

Di van hevokan de xweş diyar e ku ew şexsiyeteke çiqas welatparêz û aza-dîxwaz e. Gotineke wî heye ku bi rastî jî divê mirov kûr û dûr li ser bifikire, Apo wiha dibêje: "Bi xwedê, gava mirov bi derdê kurmancan bifikire, divê mirov her roj bigîrî, her roj bigîrî. Pir xwe xera kirine, pir rî li ber wenda bûne. Bextreşîya mezin ew e ku meznînên welatê te dijminen te bin!" Osman Sebri di 12'ê kewçêra 1993'yan de li Şamê serê xwe danî.

METİN AKSOY

## ÇAVDÊRÎ

AMED TIGRIS



### Xwedê rehma xwe li wan bike!

Z carinan ji hevalêr xwe yên li welêt re telefon dikim û li rewşa wan dipirsim. Ew êdî telefonê danayîn û pîrsa nas, dost û hevalêr xwe û me yên ku pişî 1980'î derketibûn Ewrûpayê diken, "ka rawşa wan a siyasi çawa ye û ci kaftî diken..." Ez jî dibêjim, "baş in, ji xwe re kar diken..." Lî, dîsa jî her ku ez telefon dikim, ew van pîrsan dubare diken. Ez nikarim û naxwazim di telefonê de bi nav yeko yeko behsa wan bikim. Ez dixwazim di vê nivîsara xwe de piçekî behsa wan dost, nas, hemşehrî û hevalêr wan û me yên kevn bi giştî bikim, ka ew di van 10-15 salen ku li Ewrûpayê ne, ci diken û rewşa wan a siyasi û civakî ci ye, ku ew hevalêr li welêt careke din jî ji min nepirsin.

Belê, rewşa wan a fizikî! Pirî wan werimî ne, zik berdane. Stû stûr kirine wek box û beran... Hinarikên rûyê wan sor bûne wek ên Erbakan, maşalah nûra Xwedê ji wan dibare! Porê hinekan spî bûye û yên hinekan weşiyaye û rût û zilüt bûne. Bi kurdfî û kurdfî qerte-boz bûne!

Ew heval, nas dost an hemşehrîyên we û me, pişî ku hatin Ewrûpayê, bi qasî salekêdu salan xwestin hinek tiştan bikin. Beşdarî çalakiyên wekî meş, mitîng, semîner û karûbarê komelâyetiyê bûn. Pişte hêdî hêdî wek mirîşka ku ji kurkê (qub) sar be, kom bi kom an jî yeko yeko sar bûn, bi dûr ketin. Bi karûbarê xwe yên şexsî daketin. Ji hest û ber pîrsiyariyên xwe yên siyasi û welatparêzî dûr ketin. Welat, gel û doza xwe ya pîroz ji bîr kirin. Partîyên wan jî hûr bûn, biçûk bûn bi tenê li ser kaxîzê man. Berpîrsiyar û kadroyê wan partî û rêxistinê kevn wekî wan kesen normal û ne yên polîtîk yên ku 'îş ve İşçi Bulma Kurumu' şandibûne Ewrûpayê bi pey kîrîn û vekirina aşxane, pîzafî û dukanan ketün. Dijmin, zîndan, lêdan, işkence, tenezgarî û derbederî hat jibîrkirin. Wekî ku ne bi deh salan di zîndanan de kal bibin, seqet û pûc bibin. Wekî ku ne xwedîyê dozeke mezin û pîroz bin. Wekî ku ne berpîrsiyar û serokên partî û hêzîn xwe bin. Wekî ku welatekî wan û dagirkir û neteweyeyeke wan a bindest tune be... Bi welat û gel re, malbat û mirovîn xwe jî bîr kirin. Bi kurtayî wekî ku ne kurdistanî bin, wek ku afrikî, amerîkî an jî ewrûpî bin... di demeke kurt de gelek ji wan di nav civata ewrûpî de winda bûn -heliyan. Hinek ji wan, zarokên wan çûn, hinek ji wan jî hinek jî mîr ji malê hatin qewi-tandin. Malbatî bi malbatî ve parce parce bûn. Hem ji dêrê û hem jî, ji mîzgîtê bûn.

Hinek ji wan heval, dost û hemşehrîyên we û me yên şoresgerên kevn, pişî 40-50 saliya xwe her yekî 40-50 hezar kron dan artêşa tirk û çûn li Tirkîyeyê çend mehan eskeriya tirkî kirin. Hinek ji wan li Tirkîyeyê mal û milk kirfîne û hinek jî di navbera Tirkîye û Ewrûpayê de kar û barên eksport û importiyê diken. Dîsa hinek ji wan hema hema her havîn diçin Tirkîyeyê, lê nayêne Kurdistanê. Bîn Kurdistanê ci? Axa soñ, ziwa û tazî, nav kurdên birçî û bêmal, bê hal û pêxwas û zikbirç? Ew diçin Antalya, İzmir, Marmaris û Stenbolê. Ew tûristen ewrûpî ne, ji wan re ne eyb, şerm û kîmasî ye ku bêne Amedê, Siwerekê, Mîrdînê, Çewlikê, Culemêrgê, Agîrî, Rîhayê, Bedlîsê, Batmanê û Wanê? Heger hûn dixwazin wan bibînîn û imkanen we jî hene, herin wan plajan, hûn dê muheqeq rastî wan bîn. Eddî hûn û ew û wijdana xwe dimîn! Jixwe dewlemeden me yên li welêt jî li wir in.

Li min şâfîf nekin ha, hemû kurdên Ewrûpayê ne wiha wekî hinek nas, dost û hevalen we û me yên berê ne. Hûn dikarin bejîn lê ew çawan in? Ma hûn di MED-TV'ye de nabînîn bi 100-200 hezar kron dan artêşa tirk û çûn li Tirkîyeyê çend mehan eskeriya tirkî kirin. Hinek ji wan li Tirkîyeyê mal û milk kirfîne û hinek jî di navbera Tirkîye û Ewrûpayê de kar û barên eksport û importiyê diken. Dîsa hinek ji wan hema hema her havîn diçin Tirkîyeyê, lê nayêne Kurdistanê. Bîn Kurdistanê ci? Axa soñ, ziwa û tazî, nav kurdên birçî û bêmal, bê hal û pêxwas û zikbirç? Ew diçin Antalya, İzmir, Marmaris û Stenbolê. Ew tûristen ewrûpî ne, ji wan re ne eyb, şerm û kîmasî ye ku bêne Amedê, Siwerekê, Mîrdînê, Çewlikê, Culemêrgê, Agîrî, Rîhayê, Bedlîsê, Batmanê û Wanê? Heger hûn dixwazin wan bibînîn û imkanen we jî hene, herin wan plajan, hûn dê muheqeq rastî wan bîn. Eddî hûn û ew û wijdana xwe dimîn! Jixwe dewlemeden me yên li welêt jî li wir in.

Li min şâfîf nekin ha, hemû kurdên Ewrûpayê ne wiha wekî hinek nas, dost û hevalen we û me yên berê ne. Hûn dikarin bejîn lê ew çawan in? Ma hûn di MED-TV'ye de nabînîn bi 100-200 hezar kron dan artêşa tirk û çûn li Tirkîyeyê çend mehan eskeriya tirkî kirin. Hinek ji wan li Tirkîyeyê mal û milk kirfîne û hinek jî di navbera Tirkîye û Ewrûpayê de kar û barên eksport û importiyê diken. Dîsa hinek ji wan hema hema her havîn diçin Tirkîyeyê, lê nayêne Kurdistanê. Bîn Kurdistanê ci? Axa soñ, ziwa û tazî, nav kurdên birçî û bêmal, bê hal û pêxwas û zikbirç? Ew diçin Antalya, İzmir, Marmaris û Stenbolê. Ew tûristen ewrûpî ne, ji wan re ne eyb, şerm û kîmasî ye ku bêne Amedê, Siwerekê, Mîrdînê, Çewlikê, Culemêrgê, Agîrî, Rîhayê, Bedlîsê, Batmanê û Wanê? Heger hûn dixwazin wan bibînîn û imkanen we jî hene, herin wan plajan, hûn dê muheqeq rastî wan bîn. Eddî hûn û ew û wijdana xwe dimîn! Jixwe dewlemeden me yên li welêt jî li wir in.

Hevalno! Ew Amedî û Lîciyên ku hûn di telefonê de li wan dipirsin, ew 15 sal in ku li Ewrûpayê mirine. Ez dibêjim Xwedê rehma xwe li wan bike û careke din jî wan kesen miş jî min nepirsin!

Parlementerê kurd ê berê yê Parlementoya Sûrî Fuat Elîko:

# Me xwest em doza kurdî bixin rojeva parlementoyê jî


**Em kurdên Bakur,**  
zêde tişt der barê parçeyên  
din ên welêt de nizanin.  
**Başûrê Biçûk jî, ji wan**  
parçeyan e ku em der barê  
tevgerên wê yên çandî, siyasi  
û hwd. de ne xwedî  
agahiyeke tam in. Kêm kes  
hene ku wan parçeyên welêt  
ji her aliyî ve dizanin.  
**Nûnerê me yê Sûrî**  
**HELÎM YÛSIV bi parlementerê**  
kurd ê berê Fuat Elîko re  
hevpeyvînek pêk anî.  
**Bi hêviya ku wê ev hevpeyvîn**  
xwendevanên me ji çalakiyên  
siyasi yên li Başûrê Biçûk  
agahdar bike...

**P**ejirandina we di parlementoyê de, bi ci rengî û çawa bû? Em dizanin ev cara yekemîn e di dîroka kurdên me de li vir ku rê vedibe ji wan re... Tu dikarî hineki vê babetê bidî ber roniyê?

Em di nav tevgera kurdî ya li Sûriyê di warê siyasi de, di riya demokrasiyê de kar dikin, şerê çekdarî di programa me de tune ye. Ji destpêka ku tevgera kurdî ava bûye ve, dadikeve nava karê hilbijartînê, lê tim derî girtibûn û lîstikîn mezîn di hilbijartinan de çedîbûn ji bo ku em dernekevin.

Hetanî sala 1990'ı ku ew guhertinê di cîhanê de çêbûn û pirsa demokrasiyê û mafen mirovan xurt bûbû, hikûmetê xwest hinek deriyên biçûk li se-ranserê Sûriyê veke. Û tevgera kurdî ji daket hilbijartînê. Em nûnerê vê tevgerê daketin hilbijartînê wekî nişteciyekî (rûniştevanekî) Sûrî û ne bi navê tevgerê, lê pişti em hatin pejirandin û heq dan me ku em dakevin hilbijartînê, me xwe eskere kir ku em endamên siyasi yên tevgera kurdî ne, li Sûriyê.

Ev jî di baweriya mîn de nîfîneke rast bû ku, ka emê karîbin bi rengêkî zelal karê hilbijartînê bikin. Tevî ku gelek kurdên dewlemend, xwedî malbat û kesenê nêzîkî rejimê xwe bi pêş de dan, lê miletê kurd bi piraniya xwe berê xwe da endamên tevgera xwe û em bi dengen bilind li Cizîrê (Qamişlo) bi ser ketin û rejim jî ev yek hêvî nedikir.



Ew di wê baweriyê de bûn ku tevgera kurdî parçekirî ye û gel ne li dorê ye û wê nikaribe cihê xwe bigire. Lê hat xuyakirin ji wan re ku, ev nêrin şas e û tê de ketin. Ji ber vê yekê di hilbijartînê 1994'an de pir karê xerab kirin, ji bo ku derî li ber endamên tevgera kurdî bê girtin û ew neyîn pejirandin di parlementoyê de. Bi lîstikîn mezîn nehiştin ku nûnerên tevgera kurdî wê carê bi ser bikevin.

**Parlemento ji bo çi? Ci armancêne we hebûn di helwesteke wisa de, ci rema we bû ji lîstika eskerekirin û ne eskerekirinê, we ci dixwest?**

Madem me xwe bi pêş de da, di-vê em ne wekî berê bi dizî xwe bi pêş de bidin. Ya baş ew e ku em xwe eskere bikin, di vê pergalê de du tişt derdi-

kevin holê: Yek, milletê kurd wê hest bibe ku ev eskerekirin mîranî ye, çimkî dibe ku em di eynî kîliyê de bihata-na girtin. Dudu, me dixwest ku rejîm nas bike ku pirsgirêka kurdî rastiyek e û nabe ku çavên xwe ji hebûna kurdan bigirin.

Me ji wan re eskere kir ku em bi zelalî dibêjin ku em endamên partiyê kurdî ne û em doza mafen miletê kurd ji wan dikin.

**Hejmara kurdan di parlementoyê de çawa bû, we ci kar bi hev re dikir? Yek ji bobelatê dîroka me ew e ku tu carî gotina me nebûye yek û em nebûne yekdest...**

Parlemento, li Sûriyê ji 250 endaman pêk tê, jê neh kurd bûn, ji wan em sisê, nûnerên tevgera siyasi ya kurdî

## FUAT ELÎKO

Li sala 1950'ı, İl gündê Sâlikra  
il hîla Dîrbêşîya Başûrê Bîçûk  
ji dayîk bîye. Di sala 1973'ar  
de xwendîna xwe di Ensiluya  
Matematikê de kuta kdr û  
bû manoste hetarı sala 1990'ı.  
Di hilbijartînê 1990'ı de bû  
parlementerê Herâma Cizîrê  
(Parêzgeha El Hesake)  
Il Qamîço û derdorân wê.  
Il zarokîya xwe ve terf karê  
sîyasi bûbdî. Mî sala 1968'ar  
di nava Partiya Çepê Kurd de  
kar kdr û hetarı nîha karb ut  
berdewam e, wîlî endamî  
Kombîya Navendî  
di partîya "Yekî" da.  
Ew nîha Il Qamîşloyê  
îlyana xwe didorîna.

bûn, Hemîd Derwêş, Sekreterê Partiya Demokrati Pêşverû ya kurdî li Sûriyê û Kemal Ehmed Sekreterê Partiya Demokrati kurdî li Sûriyê û ez em her siyê eşkere bûn. Ji Cizîrê û li Efrînê û Kobanê şes endamên kurd bi ser ketin, her şes nêzîkî PKK'ê bûn.

Van şes endaman xwe eşkere nedîkirin ku xwendiyê doza kurdî ya siyasi ne di hundîre Sûriyeyê de, bêhtir alîgir bûn ji me re, dema me pirsa kurdan dianî zimên, ew şes endam bêhtir ji di warê xwediderketina herêmî de kar dikirin, wekî xedemat û aloziyên di herêmîn kurdan de derdikevin, lê aloziyên siyasi û neteweyî yên eşkere tim para me bûn.

Cênd kurdên din jî 5–6 bûbûn endam, lê qet li pirsa xwe ya neteweyî û mirovayeti xwedî dernediketin, eslê wan kurd bû, lê xwe ji kurdayetiye bêrî dikirin. Pişti serketina me, em her neh parlementerê kurd li hev rûniştin, ji bo bipêxistina xebata di hundîre parlementoyê de. Em gîhiştin vê yekê ku em her sê yên eşkere nûnerê siyasta kurdî bin û her şesê din alîgirê me bin. Me dozên siyasi dianîn zimên û gelek caran me bi hev re li ser hinek helwest imze dikir, lê mixabin tifaq tunê bû di nav me de, her yekî nêrîna wî li gorî partiya wî bû. Bi vî rengî gelek cuda bûn û xilaf derdiketin di nêrînen me de.

Mînak, em li ser doza çanda kurdî



Piştî serketina me, em her neh parlementerên kurd li hev rûniştin, ji bo bipêşistina xebata di hundirê parlementoyê de. Em gihîştin vê yekê ku em her sê yên eşkere nûnerê siyaseta kurdî bin û her şesê din alîgirê me bin.

Yek bûn, me berpirsê dewletê di 1992'an de dîtin, wezirê ilam, wezirâ çandê me dît, me doza weşandina kovarekê bi kurdî kir û sazkirina komên folklorî û eşkerekirina zimanê kurdî kir. Bersiva wan jî ev bû ku nikarin destûrê bidin vî tiştî, lê dikarin hinekî çavên xwe li ber derketina kovarên toreyî û çandî bigirin. Em her sê li ser doza demokratik û hilanîna qanûnê awarte û 'Ehkam Urfiyê' û pirsgirêka jimartinê sekinîn, ji bili doza zimanê kurdî, tu dizanî zêdeyî sed hezar kurd hene bênasname (nifûs) û wekî biyanan têr naskirin (biyaniyên Parêzgeha Hesekê) û bi kaxizên taybeti têr naskirin û ji hemû mafan bêpar in.

Lê gelek cudabûn derdiketin nerînen me de, mînak: Hizama ereban, wan nedianî zimên, lê ez tim xwedî li vê dozê derdiketim û di her munasebetê de pesnê rejîmê didan di gotinê xwe de û diditîn ku pejirandina me di parlementoyê de gaveke bi alî kurdan de ye. Lê min wisa nedidît, çimkî wekî niştecihekî ereb û Sûri navêne me xistine listeyen xwe. Eynî rewş li parêzgehê din jî hebûn, ên ku xwerû ereb in.

Ev ne gavek bû bi alî çareserkirina doza me de. Na, ji ber ku itirafê bi hebûna miletê me di Sûriyê de nakin.

Gelo çîma doza dibistanê kurdî nebibû, daxwazên we li ser masîn kurdan di warê çandî de bi ci rengî bûn?

Parlemento li vir ne cihê biryaran e, waciheye-xweşibûnekê dide rûyê hikûmetê. Di serî de ji sedî 55 ji Partiya Baas in û 12 endam ji eniyê ne (Eniya Niştimanî Pêşverû). Komunist û nasîrî û ev partiyen ku Baas ew çekirine û 33 endam serbixwe ne.

Ji van 33'yan ji sedî 25 li gorî rejîmê ne, serokên elan, bazirgan, xwedî malbat û %50 jî yên mayî, ne amade bûn ku rejîmê aciz bikin. Ji serê seri kêmî dehan bi demokratîyê û probleman welêt re mijûl bûn. Biryarên parlementoyê bi dengan tim li gorî nêrinâ Baasê bûn.

Gelek tiştîn li gorî qanûna parlementoyê me dixwest, lê bi kar nedihat. Nimûne, eger deh kes jî endaman doza mijarekê bikin ku daxin danûstandinê, divê ew doz pêk bê, nîqaş bibe, lê me ji bo jimartinê 46 endaman ûmze da ji bo ku nîqaş bibe, lê hetanî dema parlementoyê xelas bû jî ev babet danexistin warê danûstandinê. Nimûne, piraniya parlementeran erê kir ku Qamişlo bibe 'Muhafeze' ango parêzgeh lê hikûmetê ev jî pêk neanî. Tewsiye ji hikûmetê venedigeriya. Ev jî li dijî yasa-yen parlementoyê bi xwe ne.

Doza çanda kurdî me di gotinê xwe de dikir, lê danexistin warê nîqa-

şê. Me doz li Serekwezîr Elzu'bî kir, got: "Wezîr ilam M. Selman bibînin." Me wezir dît, wî bersiv da ku kadroyen bi zimanê kurdî li cem wan tune ne, da ku van tiştan ji hev du derxîmin û gote ku destûrê nadîn hevalên xwe yên eniyê wê çawa bidin me kurdan û got ku ev 'neqedexekirin'a hanê bes e.

Carekê Ehmed Dirxam (Endamê Serokatiya Qutri li Sûriyê) sand dû me hersêyan û got: "Em ji we hevpeyvinê dixwazin, wekî tevgereke siyasî hûn ÷ dixwazin?" Me got em doza hebûna miletê kurd di destûrê Sûri de dikin û li gorî jimara me ya li Sûriyê, divê em di hundirê dezgehê dewletê de hebin û yet ji wan parlemento ye û derî li ber me bê vekirin di warê leşkîr û diplomasî de. Bersiv ev bû, ku ev doz giran e û gelek gav û dem jê re divê û em nikarin di iro de pêk bînîn û me û wî tev xwest ku hevdîtinê din çêbibin, em amade ne, lê wan nema xwest.

Ji çalakîyen wê demê jî gava ku parlementerên kurd ên di parlementoya Tirkîyê de girtin, me 32 ûmze dan hev ji endamê Parlementoya Sûriyeyê û me girtina wan protesto kir û liste hat weşandin di rojnameyan de.

Sûriyeyê endamê xwe yên ereb rexne kirin li ser vê helwestê û gotin ling ji bîn wan hatîye kişandin û kesen ku endamê Partiya Baasê bûn, berî wan dan, gelekan ji wan jî xwestin xwe jê bikişinîn ji tirsan.

*Çar salan karê we ketibû rewseke din, guhertinin berçav di civaka kurdî de xuya dibûn; ci bandorê vî karî li ser rewşa miletê kurd li Sûriyê bi gellemperi têr dîtin?*

Di warê siyasî de me karîbû eşke-re di nav milet de kar bikin û me semînerên eşkere çedikirin û danûstandin bi hêzên ereb re, bi hemû partiyen siyasî re me saz kirin. Me belavokên xwe di-dan wan, hêdi hêdi nêrinê wan dihatin guhertin.

Ji ber ku li cem wan me doza parçebûna Sûriyê dikir. Lî dema ku me nêrinê xwe zelal kirin ku em miletê kurd dixwazin ku wekhevî hebe û doza guhertina sînoran em nakin, ji ber vê gelek parlementer û hêzên siyasî nêrinê xwe yên pozitîf diyar dikirin û hevalên xwe ber bi doza mafen kurdan û pêkanîna mafen wî yên çandî dibirin. Vekirina vî derî tiştîkî bas bû, çimkî heta wê gavê nêrinê tevgera kurdî li cem hêzên siyasî ne zelal bûn. Di baweriya min de eger me her neh parlementeran bi dengekî ev kar kiribûya û bi berdewamî, me dê tiştîkî hêja pêk bianiya, lê mixabin me nikarî bû yet deng bigihanda dewletê, ji ber ku her yek ji me, ji berjewendiyen gelê kurd bêhtir bi berjewendiyen xwe yên parti-



Gava ku parlementerên kurd ên di parlementoya Tirkîyê de girtin, me 32 ûmze dan hev ji endamê Parlementoya Sûriyeyê û me girtina wan protesto kir û liste hat weşandin di rojnameyan de. Sûriyeyê endamê xwe yên ereb rexne kirin.

yî ve girêdayî bû.

*Di hilbijartînên çuyî de kurd mîna berê disa man li derveyî parlementoyê û der heqê gelê kurd de tu guhertînên fermî çênebûn, hûn ji wê tecrûbeyê bi ci bawerîyan derketin?*

Em bi vê bawerîyan derketin kv, divê em tim hebin di dezgehê dewletê de, yet ji südêne hebûna me di parlementoyê de ku me dengê miletê kurd gihand hemû parlementeran û hemû berpirsê hikûmetê. Lewre jî roj bi roj pirsa kurdan firehitir dibû. Çiqas em karîbin jimareke mezin bişinîn parlementoyê ew qasî wê netice, berhem, wê çêtir û baştır vegere li ser miletê me. Eger em karîbin bi dengekî bilivin di vî wari de, emê karîbin gelek derian li xwe û li doza xwe vekin.

Ez dibînim ev rîçek ji rîçen xebatê ye, divê em baş li serê rawestin. Em kar jê re bikin, nemaze di dema iro de ku tevgera demokratik bi rengekî aşti baş cihê xwe digire. Divê em ne tim di hundirê siyaseta rejîmê de biggerin, lê belê divê em dengê zelal bin, ji miletê xwe re bêtirs û bêserm doza mafan bikin û bi xurfi em karîbin wê mînberê bibin cihê serêşandinê ji rejîmê re. Lî dema em bibînin ku hebûna me -bi xwe- di wir de ye, ew doz e, ew armanc e, wê gavê em tu tiştî bi dest na-xin û wê rejîm jî süd bigire ji vê yekê. Ez bi hêvî me ku di dema bê de tevgera kurdî li Sûriyeyê li ser vê rewşê baş raweste.

*Geh derî digirin, geh jî vedikin, xu-ya ye ku têkîlyen di navbera her du ki-rinan û di navbera hêza gel de tune ye. Derî vedikin, hûn ser dikevin, derî di-girin hûn tev de li derve dimîn ang-o kilit bi temamî di destê wan de ye...*

Di sala 1990'î de gelek guhertînên girîng li dînyayê çêbûn; wekî ketîna Sovyet û hilweşandinâ diwarê Berlinê. Vekirina demokratik û di bin zora van guhertinan de û di bin bandora wan de. Xwestin hinekî destê xwe ve-kin, nemaze bûyerên Cezayîrê û hinek deveren din û pêwendiyen bi İsrail re, tirseke mezin ji guhertînê hebû û huk-mê rejîma partiyekî li tu deveren dînyayê nema. Xwestin hinekî xeleka demokratîyê fireh bikin, lewma rî dan me. Lî piştî 1994'an rewşa siyasî hat guhertin, ketîna danûstandinê bi İsrailê re. Amerika û Ewrûpâyê hinekî dest ji ser Sûriyê hilanîn. Wan jî dit ku çiqasî desten xwe ji ser dezgehan hilînîn, ew qasî cil ji bin lingên wan dikişê, di paş de vegeriyan û rî disa li ber me girtin. Diditîn nema bi hewceyi serêşandinê û eşkere berpirsekî dewletê di rûniştineke ji bo hilbijartînên nû de digot:

"Kesen mîna Elîko divê careke din

navê wan tekrar nebe."

Bi vî rengî nema deriyê parlemen-toyê li ber me vebû.

*Partiyen kurdan (bi tevahî) di gaşî-tiyeke dîrokî de dijin ku ziman, çand, tore û huner di karê wan de cihêkî bal-kêş nagirin. Çanda kudî di karê wan de bêñirx e, bi nêrîneke teng û nedirust nêzîkî rewşa tore û hunerê dibin...*

Ez ne bi te re me! Ez dikarim bi-bêjîm hetanî nîveke 1980'î me xwe bi çandê mijûl nedikir û me raporten xwe tev de bi zimanê erebî dinivîsandin û gelek ji endamê komîteya navendî ni-zanibûn elifbêya kurdî.

Ez dibînim ev rîçek ji rîçen xebatê ye, divê em baş li serê rawestin. Em kar jê re bikin, nemaze di dema iro de ku tevgera demokratik bi rengekî aşti baş cihê xwe digire. Divê em ne tim di hundirê siyaseta rejîmê de biggerin, lê belê divê em dengê zelal bin, ji miletê xwe re bêtirs û bêserm doza mafan bikin û bi xurfi em karîbin wê mînberê bibin cihê serêşandinê ji rejîmê re. Lî dema em bibînin ku hebûna me -bi xwe- di wir de ye, ew doz e, ew armanc e, wê gavê em tu tiştî bi dest na-xin û wê rejîm jî süd bigire ji vê yekê. Ez bi hêvî me ku di dema bê de tevgera kurdî li Sûriyeyê li ser vê rewşê baş raweste.

Di dema iro de gelek nîvîkar û xwendevanê kurdî çêbûne, hinek ji wan ji berhemên karê tevgera me ya kurdî ne. Lî tevî vî awayî jî hîna gelek ji me re divê, heta ku em zimanê xwe bikin zimanekî normal di nav gel de û bêhtir bidin xwendin û nîvîsandin. Lî parçebûna partiyen kurdî bû kelem di kar û xebata di vê riyê de. Me dixwest em komîteyeke toreyî ji nîvîskaran ava bikin ku bibe bingeh ji bo neqandina nîvîsarân qenc ji yên ne paqîj û xerab.

*Eger rewş bi vî rengî be, çîma pir-tûka kurdî nayê xwendin û xwendevanê rojname û kovarîn kurdî gelekî kêm in?*

Di sala 1982'an de, destpêk bû, ne hemû partiyen ev biryar girtin û ji bo wê kar kirin, rewş gelekî giran û ne li ser hev bû. Lî hêdi hêdi ev reşayî çâreser dibe û di derdorê 1990'î de hinek ronahi hat dîtin û gelek ji rojnamevan û nîvîskaren kurd ên niha serbixwe ne jî berhemên vî karî ne, digel a niha gelek kovar bi zimanê kurdî têr weşandin wek "Pirs" li vê derê û "Dugir" li Ewrûpâyê, Ehmed Huseynî û Zagros Haco û S. Melle bi karê radibin ji bili kovarîn Stêr, Gulistan, Zanîn û Gelawêjê. Ev tev de ziman dewlemed dîkin û wî bêhtir belav dîkin û bi xwendin didin.

Havalên heja\* hemê di vi ni visara xwede sê heb jinê Kurdan; ê qehre man û serlesker bi we bidin nasandin.

Yek ji wan; Rindexan e. Rindexan, di ser hildana Eliyê Unis de serleskerek bû. Likêla bavê xwe ser dikir. Di şereke giran de, Rindexan birîndar bû û kete destê dijmin. Dijmin ewi anî ser pira Malaba dî. Rindexanê xwe şji destê dijmin xelas kir û avête ava sar. Birina xedar, canê delal, di ava sar de cemidi. Rindexanê gazi kir û got; ji boyî serbesti û serfiraziya zarokên Kurdan ez canê xwe fedâ dikim.

Yê duduuya; Leyla Qasim e. Leyla Qasim ji Amediyê rabû, qû bajarê Bexdayê. Dixwest ku firoka dijmin birevîne. Lê mixabin dewleta Iraqê, ewi dit û xiste bin çav. Leyla Qasim bi işkencê giran de derbas kîrin û dawiyê de li sêdarê de dardakirin. Dijmin dixwest ku Leyla Qasim hevalê xwe bide destê dijmin û bibe xayînê gelê xwe. Lê ewi ixanet qebûl nekir û got; ez ixanetê bi gelê xwere nakim û wan nadim destê dajminê xwînxwar.

Yê dawiyê ji; Hevala ZILAN e. Hevala Zilan li ser çiyayê welatê xwe, bombe bi bedena xwe ve girêda û dakete meydana Dersimê.

# SÊ QEHREMAN



Dema ku hevala Zilan dakte nava bajare Dersimê, ê var bû û çiyayê welat hemû hêvíya tegandi-

na bomba hevala Zilan bûn. Hevala Zilan xwe hêdika berda nava leşkeran. Nedixwest ku leşkerên biyanî, li ser axa welatê wê biseki-nin û li ser zarokên Kurdan zilm û zorîya xwe bidomînin. Hevala Zilan, ji bo ku ew leşkerana ji axa wi derkevin, ew bi salan bû ku derketibû serê çiyayê welatê xwe.

Hevala Zilan kete nava leşkera û bê tirs bombe di laşê xwe de tegand. Hemû leşker ji bi tegandina bomba hevala Zilan, ji hev bela bûn û bê can li ser axê dirêj bûn. Dengê çiyayê Dersimê, bi heybeta dengê Zilan, helîyan. Hevala Zilan got; xilasi û serfiraziya zarokên Kurdan, xilasi û serfiraziya me hemûya ye. Ger ku em welatê xwe ji van leşkeran pagîs nekin, em nikarin azad bin û zarokên xwe bi coş xwedî kin.

Hevalen deial; Rindexan, Leyla Qasim û Hevala Zilan... Sê lehengen Kurdan. Sê gehreman û serlesker. Ji bo ku em zarokên Kurdan serbest bijîn, bê tirs û bêm subhe canê xwe dan. Ew ji bi hezaran şehîdîn meve ketin dilê me zarokên Kurdan. Em dizanin ku, zarokên Kurdan vê di ji yana xwe de şehîdîn xwe xwedîkin...

NEVÎYÊ MED AN

NE BER PÊŞA DAYİKA XWE

NE JÎ ZAROKÊ STARÎ

EDÎ BO NAN EZ NAGIRÎM

EDÎ QET GİLİYA NAKIM

EZIM NEVÎYÊ MED AN

BÜME ARTES JÎ BO GELAN

DIZANIM KU KURDIM İRO

TEMEN BIÇÜK BERZIM İRO

DAHATÛ ME MERDIM İRO

DI SER DE ME CENGÊ DIKIM

EZIM NEVÎYÊ MED AN

BÜME ARTES JÎ BO GELAN

NEVÎYÊ MED AN EZIM EV KURD

MIN JI ÇIYAN HÊZA XWE GIRT

BI BAWERÎ MEJÛ DAGIRT

WELATEK NÛ AVA DIKIM

## GULÊN WELATÊ ROJE

Merheba ji we rehevalê min. Merheba ji we re zarokên Kurdan. Ez bawerim hûn tev ji cihanek weki ava zelal dixwazin. Û hûn naxwazin kuştin, ser û xirap kîrinê. Lê mixabin rastîya cihanê ne wîsaye. Ev cihan bersîva daxwazê me zarokan nade.

Belê hevalno, hûn ji dizanin dîroka me Kurdan de herdemi kuştin, şewtandin û penabef heye. Va frojî hêj berdewame. Belê, fro leşkeren me derketine çiyê, ser dikin, ji bo vê dîroka gemar wergerîn cihanek nû ji mera amadekin. Da edî em di penc salîf, şeq salîf ya xwe de mirine ne binin.

Belê hevalno, ev dijmin ji zarokan ci dixwaze? Hineki ji me li bin siya daran dikuje; hineki bi paletên tangave girê dide; hineki me di malande dişewtine û hineki ji di hembêza dayîka xwede razayîne getil dike. Ji ber kû naxwaze hatinek nû, serbixwe û azat gebe.

Em dibêjin bese! Bila şer nebe. Bila zarok neyîn kuştin. Dîsa do Dilan û Berivan li Edenê kuştin û bersîva aşîtiyê dan. Dilan û Berivan, aşîti dixwastin. Şer û kuştin ne dixwastin.

Belê hevalno, ev tiştên ten serê me, tev ji jibo serxwebûn û azadiyameye. Gerekî em ji jibo Azadî û serxwebûna xwe, xwe amade bikin. Ew herdû Gulen Welatê Rojê, bi destê xwînxwaran, şeveke tarîde hatin kuştin. Lê bila Ew xwînxwaran bîzanîbin ku, zarokên Kurdan bi kuştin û lêdanê xelas nabin. Ew herdû gulen me, wê her dem di dilê me de bijin. Ew ji êdi şehîdîn welatê me ne. Emê bersîva herdû gulan, bi kezkirina welatê xwe bidin.

Ev xebata li jorê, ji aliyê girtiyê tevgera azadiyê ve, ku li Girtigeha Umraniyê ya Stenbolê dimînin, hatiye amadekirin. Weki rûpeleke amadekirî ji me re du heb hatiye şandin û xwestine ku em wê biwesînin. Di nameya xwe de wiha dibêjin:

"Em ji rojnameya Azadiya Welat, bi evîndarî, bi kêfxweşî dixwînin û dişopînin. Em dizanin ku bandora Azadiya Welat li ser gelê me ji pir e.

Ji ber vê yekê bona zarokên kurd me çend nivîs amade kirine û em bi tevî pêşniyazê xwe, pêşkêsi we



DÎLAN

BERÎVAN

BI TEMENÊ XWE BIÇÜK

BI CANÊ XWE NAZIK

EM DÎLAN û BERÎVAN IN

DEŞPÊKA BEREANGÊ

Û GULÊ WELATÊ ROJÊ NE...

Herdû şehîdîn me Dilan û Berivan  
wê di Tekoşîna me de her dem  
Bijin!....



Li navendê çandeyf çalakîyên vê hefteyê. Li NÇM'a Stenbolê

● 5.10.1996 Şemîf

Konsera: Seid Yusif, saet 15:00, Konsera: Nevzat Karakış, saet 18:30

● 6.10.1996 Yekşem

Konsera: Seid Yusif, saet 15:00; Konsera; Resîtîl Keman, saet 13:30

● 9.10.1996 Çarşem

Li ser mîltîrîzm panel, saet 18:00

● 11.10.1996 İñ.

Hunerên dîltbarî

Film: "Dünyayı sarsan on gün."

Li NÇM'a İzmîrê

● 5.10.1996 Şemîf

Şano: Ada, saet 18:00:

Li Evrensel Kültür Merkezi

● 5.10.1996 Şemîf

Şanoya zarokan: "Bir şeftali Bin şeftali", saet 11:00

● 6.10.1996 Yekşem: Semîner: "Devrlîm ve propaganda" (Şoress û propaganda), saet 14:00, Şano: "Soyutlamalar Mahkemesi" saet 19:00

● 7.10.1996 Duşem

Film: "Ari Kovarı" Yön. Mario Camus, saet 19:00

## RÜDAN

Ji NÇM'ê kovereke çand û hunerî:

# Jiyana Rewşen

Di Jiyana Rewşenê de dosyaya li ser Apê Mûsa balkêş e, di dosyayê de digel çirokeke Murat Batgi ya bi navê "Apê...", çend nivîsên û agahiyên li ser Apê Mûsa yên ku di weşanên cur bi cur de derketine jî, hatine weşandin.

Navenda Çandê ya Mezopotamîyayê dest bi derxistina kovareke mehane ya çand û hunerî kir. Navê vê kovarê "Jiyana Rewşen" e. Di kovarê de gelek nivîsên cur bi cur wekî; helbest, çirok, hevpeyvîn û nivîsên li ser sinema û şanoyê cih digirin. Di sergotara kovarê de tê gotin ku kovar wekî dûvajoya kovara Rewşenê ye. Di vê hejmara kovarê de bi taybetî dosyaya ku li ser Apê Mûsa hatiye amadekirin balkêş e, di dosyayê de digel çirokeke Murat Batgi ya bi navê "Apê...", çend nivîs û agahiyên li ser Apê Mûsa yên ku di weşanên cur bi cur de derketine jî, hatine weşandin. Di rûpela duyemin a Jiyana Rewşenê de helbesteke Seroka NÇM'ê Nuray Şen heye. Ji bili wê helbestê, helbesteke M. Zahir Kayan û yeke Hesen Zinar di vê hejmara kovarê de cih digire. Zimanê kovarê bi giranî kurdi ye, lê di sergotarê de tê diyar kîrin ku ji ber rewşa kurd a îroyîn, wê di destpêkê de cih bidin nivîsên bi tirkî ji. Di vê hejmara de jî nivîseke Ahmet Soner bi tirkî derketiye. Ev nivîs, der barê pirtükîn ku li ser Yılmaz Güney hatiye nivîsan din de ye. Ahmet Soner pirtükîn li ser Güney yek bi yek dinirxîne.

Di gel nivîseke Seroka NÇM'ê Nuray Şen a bi navê "Dengekî Rizgar û Jiyaneke Serkefti", nivîseke Müslüm Yücel ku ji tirkî hatiye wergerandin û nivîseke Medenî Ayhan (ev nivîs ji ji tirkî hatiye wergerandin) di vê hejmara kovarê de cih digirin. Her wiha Esma Eksenê bi nivîseke li ser vebûna NÇM'ya Mêrsinê û Kemal Orgun ji li ser rewşa şanoya kurdi ya îroyîn radiweste.

Di vê hejmara de tekafe nivîsa ku bi kirdî derketiye ji ya Cemil Gündoğan e. Gündoğan li ser encama civîna Stockholmê rawestiye. Dîsa Feqî Huseyn Sağınç li ser seydaye xwe "Mele Os-



JI BO BİRANINA APÊ MUSA

man" nivîsek nivîsandiye. Jiyana Rewşenê cih dide hevpeyvîneke digel helbestvanê kurd û nûnerê rojnameya me Jan Dost. Ew bi giranî li ser helbest û rewşa helbesta kurdi ye. Di dawiya kovarê de xâcepîrseke bi xelat cih digire, vê xelata hejmarê kaseta Koma Agirê Jiyân "Adarê" ye.

Min divê ez li ser zimanê kovarê ji çend tiştan bibejim, bi hêviya ku di hejmara diduyan de li ber çavan bê girtin. Di warê rastnîvis û rîzman de gelek çewtî balê dikişînin. Bi taybetî di warê bikaranîna cînavk û tewandina navdêran de. Ji bo vê yekê, mînakîn herî balkêş, sernavê nivîsa Kemal Orgun û ya nivîsa Nuray Şen e; "Teatra Kurdan Ya Netewî û Pirsgirêkî Wi", "Dengekî Rizgarkîrî û Jiyaneke Serkefti". Di her du sernavan de jî çewtiyeke diyar heye. Di nivîsa Kemal Orgun de teatr mî ye, lê cînavkî ku li şûna wê hatiye bikaranîn nîr e. Her wiha di nivîsa Nuray Şen de jî, jiyan wekî navdêreke nîr hatiye tewandin, pêwist e 'jiyanekî serkefti' bûya. Di nivîsa çiroka 'Apê...' de jî gelek xeletiyen tewandina navdêran û çewtbikaranîna cînavkan hene, ew ji xwendina vê çiroka bedew, dijwar dîkin. Her wiha bi dîtinâ min mezînnîvîsîna hemû tipêr serî yêne peyvîn sernavan, ji aliye estetikî ve baş xuya nakek. Her wiha, ez tênegihîstim ka di kovareke mehane û çand û hunerî de navenda nûcayan ci karî dike.

SAMÎ BERBANG

## TÎSK

LERZAN JANDÎL



## Apo Musa

M a de yew qesa esta. Vanê "merdene rî kes şâ nêbeno". Her kes kuno re mendene ver. La belê tenê merdenî/shahadeti estê, ke jiyana mi de jî kiştena apê Musayî cayêde niyanê guret.

Cinay re? Hetanî ke televîzyonê almanan de mi Apo Musa nêdî bî, mi teyna namey dê heşnay bî. Nê programê almanan de tesîrîde girs mi ser ro viraşt. Zaf rehet bî. Xo ra bawar bî. Zanitêne o ci vano û se vano. Wayîrê zekayêde bariye rehet bî. Her ci ra ver jî bêtters bî.

Bado dest kerd ci, Rojnamaya Welatî de nivisna. Rojnameye ke kewtene mi dest, niviso verêno ke mi wendeno, nivîsê Apê Musay bî. Xêca naye nivîsê Apê Musay yê ke rojnamayanê bînan de veciyêne jî mi nîremnîne, verde nivîs dê wendêne.

Seke êno zanayene Apê Musay zaf rakerde nivisnîne. Çep û raşte xo çînê bî. Her ci, hama her ci zaf zelal vatêne. Demoke Silê Şuyanî rî, Türkçe û yê bînan re meydan wendêne, kîfî mordemî amêne. Demoke xebêr dêne, mordem tede nîdêjêne, la belê kîfî xo amêne. Ez bawer a, eke Apê ma ewro weş biyêne, se barbaran û qetîlanê, ke Amed de desûyew canê ma kîstî, ra se xebêr bidêne. Se xo beştene wertê kila adirê guretiyanê Sağmalcılarî...

Apo Şêxo nivîsê xo yê verêni de venga xotan day bî. Vatêne; "Piyê minê xortênen, ez şima bîvînî". Apê Şêxoyî nivisanê xo de wayîrveciyena welaşî, eşqê welaşî, cînika kirmancan, rîndiya welaşî, eşqê wendene, felsefe, kîştena Wusen û daye ra dimê jî seba welaşî mendene ebi zonêde weş û şîrîn ardêne ro zon/ziwan.

Ha zanayêna xo ra, ha kinca xo ra, ha şalaga xo ra Apo Musa mordemêde bîn bî. Mordemo ke kirmancî musayê ci nêbî bî.

A ci hîratiye biye. A ci zanayene biye. A ci rakerdiyene biye. A ci çimtarîtiye bêttersiye biye. A ci heskerdena welaşî biye. Sozê xo zê gula, qelema xo zê çekî xebetnîne.

Kam şîkîno cayê welaşperwîra dê, seba welaşî ra mendene re amadebiyena dê, kirmancan ra heskerdena dê, xayîn û bêbextan û nêzanayan ra xeberdayêna dê bigêro/bicêro.

Apo Musa seba roşnabîran jî mînakêde bêbaha bî. An gorê bawariya mi, hetanê Apê Musay ra heto tewr biqedr, no hetê dê bî. Apê Musayî hemverê politika şas û çewte, yan jî eke ê çiyê şas bidiyêne, bawariya xo zaf tuj, bêtters vatêne. Kam biyêne wa bibiyêne bawariya dê nîwuriyêne. Her çığa ke kesî, partî, bawarî rexne kerdene jî, piyayê yewtiye bî. Modemê bîratî û haştiye bî. Maşiqê azadî û serfîraziye bî.

Ebi kilmiyê mordem şîkîno ke veco, Apo Musa seba roşnabîranê ma, seba qom û şarê ma, seba xortanê ma zê yew aynî bî/ aynî yo. Ganî ma Apê xo de niyadîme û tede xo bîvînîme.

Der heqê apê Musay de zaf çiyî amê nivisnayene û ênê nivisnayêne jî. Nê teyna bes niyê. Ganî bê sîndor bêrê nivisnayene. Ebi na wâştene ez verê şahedetê apê ma de ebi hurmet êna re çokan. Rehet ra kuye Apo! Tornê to, xortê to raya mordematiye û azadiye ra şono. To jî na nîwaştene? De ke hêni ro, bê qisawet rehet ra kuye Apê mino qenc!

# Xelata Gulê

**E**w roj wekî "Roja Dayikan" dihat diyarkirin û pêşkêskirin. Li hemû cihanê û bi taybetî van salên dawîn li welatê me jî, ev roj dihat pirozkirin. Her çend di destpêkê de ji bûrjûvayan çêbûbe jî, bi bandora navgînên ragihandinê, li hemû dinyayê bi dorfirêhî belav bûbû û hatibû pejirandin.

Di wê rojê de ji dayikan re xelat dihatin pêşkêşkerin. Her çiqas xelat, li gorî dewlemendiya xwediyê xwe be jî, li gelek hêl û welatan dişibin hev. Xelata hinek dayikan maçikirin, ên hinekan jî, ji hêla zarokên xwe ve gotina çend gotinên xwes, standina çend kincêñ rengin û diyarkirina çend gul û mexikên (qerenfil) sor bû.

Gulê ji navçeyeke Kurdistanê ye. Haya wê jî, wekî gelek dayikên welatê wê, ji vê rojê tune bû. Ew heta niha çi li mala bavê xwe, çi jî li mala mîrê xwe tu rehetî û rojeke xwes nedîtibû. Temenê wê hatibû cil salî. Ji ber ku ji roja ku xwe nas kiribû çi li malê, çi jî li derive di nav kar û bar de bû, wekî pirejineke şest salî dixuya...

Wê rojê, "Roja dayikan" dihat pirozkirin. Qîrîn û hawara Gulê, wekî ku hemû giyanewer tev biqîrin, wekî topa ezman bi ser bajêr de diket, bû. Bes ne zindî, hemû avahî, kolan, çem, çiya, dar û ber jî ji vê qîrîn û hawarê dihejiyan û ji ber ku Mihemedê Gulê neparastibûn, dilteng û xemgîn dibûn...

Gulê yek caran lawij dihonandin, car caran jî gazin û nerazîbûna xwe ya jiyanê, ji Yezdan re diqîriya... û gelek caran jî wekî pût û kevirekî bêrih, bêliv, bêzar û lal û ker dima. Bi çavêñ vala li dîwarê li hemberî xwe dinêri.

Dema ku wiha bêliv dima, jiyanâ wê bi taybetî jiyanâ ku bi Mihemedê xwe re dest pê kiribû, di ber çav û mîjiyên wê re derbas dibû; wê roja ku Gulê zarokek anîbû dinyayê, gelek şad bûbû. Te digot qey jî nû ve bi jiyan bûbû. Keçekî wê jî hebû, lê ku ew jî keç bûya..? Hemû dijwarî û mezinkirina Mihemed û wê rojê... Roja ku otomobil hatibû ber derî... roja ku Gulê hemû tirs û xofêñ xwe bi barandina rondikan ji dilê xwe der dikir. Roja ku otomobile Mihemedê wê ji ber derî jê qetandibû û derxistibû rîwitiya ku dawiya wê ne diyar e.

Wê rojê, Gulê bi çi hestan av li pey otomobile û Mihemedê xwe rîtibû..? Cerê avê li dû wan vala kiribû. Ji bo ku av, riya Mihemedê



**Wê rojê, "Roja dayikan" dihat pirozkirin. Qîrîn û hawara Gulê, wekî ku hemû giyanewer tev biqîrin, wekî topa ezman bi ser bajêr de diket, bû. Bes ne zindî, hemû avahî, kolan, çem, çiya, dar û ber jî ji vê qîrîn û hawarê dihejiyan û ji ber ku Mihemedê Gulê neparastibûn, dilteng û xemgîn dibûn... Gulê yek caran lawij dihonandin, car caran jî gazin û nerazîbûna xwe ya jiyanê, ji Yezdan re diqîri û gelek caran jî wekî pût û kevirekî bêrih, bêliv, bêzar û lal û ker dima. Bi çavêñ vala li dîwarê li hemberî xwe dinêri.**

wê veke û bi xêr here, bi xweşî were...

Mihemed hê di hijdeh saliya xwe de bû. Dibistana amadeyî nû qedandibû. Ji bo ku bi dereke din ve neçe (!) û bi bertilê be jî di dezge-heke dewletê de bikeve kar, bavê wî temenê wî dabû mezinkirin û zû bi zû şandibû leşkeriyê. Ji ber ku dewletê Mihemed şandibû bajarekî rojava, bi vê yekê gelek kîfxwes bûbûn; Mihemed, wê ji şerê kirêt dûr biketa.

Hê sê heyva (meha) çûna Mihemed neqediyabûn, ew xebera reş hat. Wê roja ku di TV û rojnameyan de wekî roja dayikan dihat daxuyandin, wê roja ku ji dayikan re hemû diyarî û gotinên xwes dihatin pêşkêskirin...lê ew roj ji hinek dayikan re roja şîn, girîn, qîrîn, hawar û reşgirêdanê bû; roja şar û laçik çirandin û porkişandinê bû. Vê xebera reş, têkiliya hinek dayikan bi jiyanê re qut kir û çiraya wan vemi-randibû, hêvî û xeyalê wan tunekirin bû.

Erê, wê rojê xelatên dayikan, sedemê jiyanâ wan, cendekê dilovanê wan bûn. Ew roj bûbû roja ku ji qîrîna dayikan tu zindî nikaribûn debara xwe bikin...

Ji çavêñ Gulê hew rondik dihatin; bêdeng, di hundirê xwe de kizirî... Gulê dîsa wekî pûtekî bêliv mabû, difikirî û ew ji xwe dipirsî:

"Çima min hişt ku here leşkeriyê? Ji bo ku here ji romê re leşkeriyê bike û wî bikujin, min ew mein kir?

Kurê Xezê jî li leşkeriyê ji aliyê serleskerê xwe ve nehatibû kuştin û negotibûn ku wî xwe kuştive? Lê hevalên wî gotibûn: 'Car caran stran bi zimanê kurdî stirîne, ji ber vê sedemê hatiye kuştin.'

Gulê ji ber ku bûyerên wiha nedabûn ber çavan û bi gotina mîrê xwe kiribû, hezar caran poşman bûbû û xwe ji vê yekê re tawanbar didit... Li serê xwe dixist û digot:

"Xwezi tu li serê çiyayê me bûyayî, tu müşexti an jî girtiyek bûyayî... Lê mixabin Mihemedê Gulê delalê dilê wê ji kuştina bi navê 'zaiyata perwerdehiyê' nefilitibû.

Dagirkiran nehiştibûn cendekê Mihemed vekin û lê binêrin, bê ka di perwerdehiyê de bi ci rengî û çawa hatiye kuştin, berik li mîjî, li çavan, li dil ketiye...

Wan marêñ kor çawa û bi ku derê canê wî vedane..?

# Ji berpirsê rojnameya Azadiya Welat re

**Weşanxaneya Avestayê ji ber nivîsa D.Ş Tizyanî ku heftiya berê di vê rûpelê de derketibû, nivîsek bi navê tekzîb ji me re şand. Bêyî ku em destê xwe bidin ziman û naveroka wê, em wê diweşînin.**

**D**i hejmara 35'an a rojnameya Azadiya Welat de bi navê D.Ş. Tizyanî, bi sernivîsa "Ji Evdila Peşew ne helbest helwest" nivîsek weşîya.

Fonksiyona rojnameyekê a herî gi-ring —heke rojname be— formasyon e, agahdarî ye, agahdariyeke rast... Çapemîniya kurd divê ji her alî bêhtir hassas be. Ji bo tradisyonice baş a çapemîniye di nav kurdan de çêbibe; pêwist e Azadiya Welat, ji her rojnamê bêhtir bi mesuliyet kar bike. Gotin û iştamîn Tizyan li aliyekî ev "nivîs" ji serî heta bi dawî defomasyon e. Ji bo mirov xeletiyen Tizyan nîşan bide, divê nivîseke du cara li a wî binivîse. Emê di vir de ji bo xwendevanan agahdar bikin, li ser çend xalan bisekinin:

Berî her tişti sernivîs bixwe xelet e. Tizyan, li gor kijan pîvana "edebî", ji van helbestan re dibe "ne helbest, helwest"? Peşew, di pêşgotina Birakuji de dibê; "Ji bo yekî li ber xeniqandinê awayê qîrînê ne girîng e, xurtiya qîrînê pê gi-ring e. A ku li ber destê te ye berî helbeste helwest e." Di vê berhevokî de, ne tenê Birakuji, şîfrîn wî yên curbucur hene. Li gor vê sernivîsê Birakuji tev de, "Sendan Sal e", "Li Ber Derî", "Sile" ji ne helbest in. Tizyan, xwendevanan ji pîvanîn xwe yên "edebî" agahdar bike, wê gelekî baş be. Belkî li vî welatê kambax —ne kambax bûya yên wek Tizyan nedîbûn "rexnegir"— herkes zanibe bê ci helbest e, ci ne helbest e!

— Wek ku agahdariyeke gelekî girîng be, editorê rûpelê kiriye spot: Spota nivîsê ji xelet e. Heta niha 7 kitêbên Evdila Peşew çapbûne. Ji wan "Birakuji" û "Şew Niye Kewnan Be We Nebînem" li ba me ji hene, em kopiya bergê wan ji we re dişinîn. Kitêbeke ku Tizyan nedîtibe, haya wî jê nebe, nayê wê maneyê ku çap nebûye. Tizyan ne kutubxaneya netewî ye!

— Tizyan, "Veger" û "Birakuji" wek sernavén du şîfran nîşan dide. Kitêb, li ba we ji heye, hûn dikarin lê binérin; bi van herdu navan şîfr nîn in. "Birakuji" navê diwanekê ye ku me şîfr jê hilbijartine, navê "Veger" ji weşanxanê danî. Evdila Peşew, pişti demeke dirêj vedigeriya welatê xwe. Ji bo me ev bûyereke edebî bû. Navê "Veger" ji wir tê.

— Exlaqekî nivîskariyê heye: Wexta tu nivîsekê, tiştekî ji devekerê din iktîbas bike, bigre, li gor te xelet ji be divê tu wek eslê wê binivîsi. Wisa xuya ye ku haya Tizyan ji vê qaîdeya exlaqî jî tune ye. Xwedîgiravî xeletiyen rast dike: Rêzan diguhere. "Hayîdar be" dike "Hayîdar be", "Jahrav" dike "Jehraw." Herkes dizane ku "Jahrav" ji du peyvan; "jehr" û "av" pêk te. Gotineke hevgirtî ye. Di Soranî de ji: "Jahrav" tê nivîsandin. Me jahrav bikaranî. Xeletiya vê ci ye? Tizyan vî mafê guhertînê çawa bi xwe re dibîne? Di wergeren xwe yên giranbuha de, dikare "Ayşe" bike "Rewşê." Lê guherîne wergera kesen din ne wezîfa wî ye. Bila herkes hedde xwe zanibe.

— Tizyan, hedde xwe nizane. "Kêm şareza" tê ci maneyê? Gotinê ji serê xwe mezintir dike. Em van gotinê wî yên eletewş lê vedigerînin. "Ehliyeta" şîrî ji kuderê standîye? Pîvanîn wî, zanîna wî ya li ser zîmân ci ne? Berî "rastkirin" a zîmanê şîrê, bila pêşî hevokên xwe rast bike. Ew zîmanê xwe yê bedew, xwendevan li aliyekî, bi xebatkarê rojnamê çiqası daye qebûlkirin? Kijan kurmanc rast-çewt bi dehan peyvîn soranî ku kurmanciya wan herkes dizane,

di nivîsekê de bi kar tîne? Nivîsa bi kurdi kareki pîroz e, ciddî ye; ne ji bo tatmîkirina kompleksa ye.

— Her wergêr wek Tizyan ne bi qabilîyet e ku bikeve rûhê helbestvan û ji helbestvan çêtir fam bike ku ci gotiye. Heçî meraq dike, bila li Azadiya Welat hejmara 20'an, li rûpel 10 binêre. Wê bibîne bê Tizyan çawa ketiye ruhê Ahmed Arif de û ew rûhiyat çawa herimandiye. Wergêr, tişta li ber xwe werdigerine. Evqas komedi û kompleks ku dikevin ser hev, dibin "karesat."

— Tizyan bi 2-3 pîrsan dawî li nivîsa xwe aniye. Ev nivîs, ne ji bo nivîsa Tizyan a ku nav û naverok hevdu temam dikin, hatiye nivîsin. Ji bo kesen ku ev kitêb û weşanîn me yên din nedîtine hatiye nivîsin. Ji bo tu kes primê nede van gotinê erzan.

Ji bo rojnamê ji divê çend tişt bêngotin: Berî her tişti hûn rojname ne an ji dîr? Mafê aforozkirinê bi papazan re heye, ne bi rojnamevanan re. Ji dêla rast-çewt her tişti binirxînin, rexne bikin; li karê xwe binérin. Hûn hîç fikirî ne ku bi awireke rexnegirî xebatîn we bêñ nirxandin? Hûn hîç xwe muhasebe dikin? Karê we li ber çav e, berî şujinê di xelkê re rakin, berê derziyê ji bidin xwe!

Tu kes nabêje bila rexneyen negatîf nebin. Lê ev "nivîs", ne rexne ye, ne ji nirxandin, hed û hudûd rojnamegeriyê ji derbas dike. Mimkun e, hûn ji herkesi şarezatir bin; ev mafê ku hûn kesen din di rûpelan xwe de bi "kêm şareza" yî yê iştam bikin nadê we. Bi vê helwesta taçîzkar wê ci li rojnamê zêde bibe? Hûn ne dadgeh in, kitêbên me ji ne sucdar in. Ji bo kurdan tişta herî gi-ring ku herkes karê xwe bike, karê xwe baş bike û kari-be ji bin wî karî rabe. Divê herkes li ka-re xwe binêre.

Azadiya Welat, rojnameyeke hefteyî ye. Di van rojîn ku bi dehhezaran kurd, ji şerê birakujiye direvin, li ber sîmorê dagirkiran dibin pêl, bi navê "Birakuji" kitêbek weşîya. Di danasîna her kitêbek

de mirov dikare li ser deh-pazden nuqtayen bisekine. Ziman ji yek ji wan e. Kurdi hêdî hêdî dibe zimanekî nivîski. Hûn dizanîn di ziman de referansa hin nivîskaran an diya wa ye, an ji pîrik. Wexta tu ji hin nivîskaran dipirse; "Te ev peyv ji ku ani?" Dibê "Min ji pîrika xwe bihist, diya min wîsa digot." Mesela zîmân divê bi tolerans be. Ji ber ku dayîk û pîri-kîn herkesi ne wek hevdu dipeyivin û difikirin. Pişti wê ziman ne tenê gramer û imla ye. Mantıqke zîmân heye, bicibûna peyvan, mecaz, îma, bingeha psikolojik a peyvan, guherîna maneyan... Ziman pîralî ye; ilmek e, haya we ji linguistik heye? Edebiyat ji aliyê zîmân de ji qadeke taybet e. Zimanê her çeşnê edebî cihê ye. Hûn van tiştan tev de piçekî bidin ber çav û bixwînin wê baştar be.

Azadiya Welat rojname ye, ne akademiya ziman. Şûrê hûn dixwazin bigrin destê xwe, di destê tu akademiyan de nîn e. Türk Dil Kurumu biqasî we heq bi xwe re nabîne ku mudaxeleyî weşanen bikî. Hûn ci dikin? Vi heqê ku bi tu kesi re tune ye hûn ji kuderê û kî distin? Hûn çawa evqas bawer in bizanîna xwe? Hûn hîç nafikirin bê cîma li bajarekî ku 3 milyon kurd lê dijin 300 heb rojname nayê firotin. Di vê izlas-yonê de qey hîç rola we û karîn we nîn e?

Gotina dawî: Vê nivîsê xelet fam nekin! Ne nivîsa Tizyan, hezar nivîsin wek a wî, biqasî serê derziyê tesireke negatîf li weşanîn me nakin. Jixwe kes ji —li serî ew— ji nivîsa wî tiştekî famnakî. Ji herkesi bêhtir em vê rojnamê û weşanîn din ên kurdi —tevî hemû kîmasiyen wan— ciddî dibînin. Ü belkî ji we hemûyan bêhtir girêdanek me ya manewî bi vê rojnamê re heye.

Hînekî din mesûliyet!

Hînekî din ciddiyet!

Ji bo vê em dinivîsin, ne ji bo tiştekî din!

AVESTA

## Memed li mal e?

JAN DOST



**B**i rastî nivîsindina ji bo rojnameyeke hefteyî ne hêsan e. Xasma ez bi hezaran kilometre dûri navenda rojnameyê me û bi hezaran bend û kelem li pêşîya min hene. Lî em çawa bikin, qedera nivîskaren kurd ji, qedera gelê kurd ji tarî û reş e. Ne bi tenê sînor li ser axa me hene, lî di navbera saziyên me de ji hene. Heta ku em berhemeyeke ku li pişt sînor derdikeve, bi dest dixin çavên me derdikevin.

\*\*\*

Havîna çûyî, li Tehranê ez bûme

mêvanê birêz M. Reûf Tewekolî. Ew nivîskarekî ji Rojhîlatê Kurdistanê, ji Banê ye. Wî ferhengeke hêja diyarî min kir, navê wê "Bedayîl luge" ye....

Ferheng berî sed û sîh salî hatiye nivîsindin û gelek hêja ye. Ji ber ku ew ferhengeke kurdî-farisî ye, ez li ser dixebeitim û dixwazim bikim kurdî-kurdî ji bo ku em karîn feydeyê jê bibînin.

Di xwendîna vê ferhengê de ez li peyva Memed, rast hatim. Elî Ekber weqayî Nigar (nivîskarê ferhengê) ev peyvîsî rave kiriye:

Memed ji Hz. Muhammed re dibêjin û di nav kurdan de meşhûr e ku rojekê Hz. Fatima ji pêxember pîrsiye:

"Ma ziman ji bilî zimanê erebî li dînyayê hene?"

Pêxember bersivê dide:

"Erê. Pir in, yek ji wan zimanen ji zimanê kurdî ye!"

Hz. Fatime diheyire û dipirse:

"Zimanê kurdî ci ye?"

Wê hingamê dengê derî tê, Hz.

Fatime radibe, da ku nas bike ew kî ye, dibîne yek rawestiyaye û dipirse:

"Metê Memed li mal e?"

Hz. Fatime fêm nake û li bavê xwe vedigere û jê re dibêje:

"Yek li ber derî ye û dibêje,

'Mehemed li male'.

Pêxember dibêje:

"Ev zimanê kurdî ye, û ew kes Hz. Cebrâîl e, de here û bersiva wî bide û dibêje 'Belê, li male'."

Bi rastî tu gotin ji vê hadîsê re nîn e, lê xwezî hedîsîn ji vî celebî bi hezaran hebûna, ji bo ku hînek misilmanen kurd yên dîndar xwe û zimanê xwe kêm nedî-tana û wekî dîndarê her mileti xizmetê ziman û edeba xwe kiribûna û wekî Xanî dibêje:

"Tekmîl me dikir dîn û dewlet, tehsîl dikir me ilm û hikmet..."

# Dîzî û berzeqîya mele

**M**eleyekî berzeq diçe kîjan gundi, ji ber ku ehlaqê wî xerab e gundi berê wî didinê. Mele di ce cem seydayê xwe dibêje:

—Wele seyda ez diçime kîjan gundi, berê min didin, divê tu riyeke nîşanî min bîdi ku îcar ji berê min bidin, êdî ezê dev ji meletiyê berdim.

Seydayê wî dibêje:

—Ezê ji te çend pîrsan bikim, heke tu bersivê rast bîdi, ezê riyeke nîşanî te bidim.

Kerembike seyda...

—Min bihist ku te li gundekî çav berî jîna mirovekî daye. Gelo çîma, te tiştekî bi vî rengî kir?

—Ê seydayê min ez ci bikim du jînên wî mirovî hebûn, a biçük pir xweşik bû. Min got wele jîna min tune ezê fîlekê li serî mirov bilizim, bila jîna xwe berde, ezê ji xwe re bistînim. Ma ev tiştekî xerab e qey?

—Çîma berê te dan tu wî ji bibêje.

—Min li mizgeftê bang da got ku, heke du jînên yekî misilman hebe, divê ji-neke xwe berde. Bila yên ku jînên wan tun in ji bê jîna nemînin. Roja din jîna wî mirovî bangî min kir, got: “Mêrê min pir nexwes e, divê tu werî ser de bixwînî” min ji kitêba xwe hilda ez çûm de ka binêre ci bû. Ez çûm min dît ku mî-



rik di nav nîvînan de li ber sekerebatê ye, hema hema dimire. Wî ji min re got: “Ezê wesiyetê xwe bikim tu ji şahidî” min ji got kerem bike.

Dest pê kir got: “Zeviya min û kera min ji te re, hin peyayen min ji hene nîvî ji jîna min a biçük, nîvî ji ji ya mezin

re. Min ji got: “Xwedê ji te razî be.” Domand got: “Jîna min a biçük ji bila teslimî te be, mele” min ji got: “Xwedê cihê te bike cinet.” Hema ji nav nîvînan rabû, rahişte dar, da pey min. Wele ez ji kuştinê xerabtir kirim. Hê wê ji têrê nekir gundiyan ji berê xwe

dane min, wele wekî sekê şil kutan. È sûcê min çibû de ka bi bêje?

—Li gundekî din ji dibêje te dizî kiriye rast e?

—Ma wele seydayê min, ez zef birçi bûbûm. Dilê min goşt dixwest. Ez çûm min mirîşka cîranekî dizî, şerjê kir û min bi cîranekî din ve me tev xwar, iça qet di vê de guneh heye?

—Piştre te ci kir, bibêje?

—Wele min ji bir kiribû serê mirîşkê neavêtibû, dotira rojê xwdiyê mirîşkê hatibû û serê mirîşkê dîtibû. Wele wan ji ez kutam, berê min dan.

—È bêje ka li gundêne din ci hate serê te?

—Xwêdê neyne serê kafiran, ez ci bîbêjim. Giştik wekî hevûdin bûn. Min li gundekî ji, cihê pênc kod genim, zikat deh kod stand a li wir ji pê hesiyan, dişa berê min dan. Li gundekî ji ez li ke-ra mirovekî siwar bûm çûme bajér, min li bajér ker firot; a li wir ji berê min dan. Tiştên wekî van bêqîmet min dikirin. Ka bêje seydayê min ku dera van sûc e?

—Wele kurê min ez ne, Xwedê ji nikare riyeke nîşanî te bide. Hema here karê xwe bidomîne an wê gundi te bikujin, an ji tuyê dev ji karê xwe berdi.

MELEK BIRÜSK

## BIXELAT...

## XACEPIRSA BIXELAT (36)

## XACEPIRSA

ŞİFRE	A	B	C	D	E	F	G	H	I	J	K	L	M	N	O	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z	
ŞİFRE	S	X	F	M	O	K																					
BERKEKAT	B	E	R	K	E	K	A	T	S	E	Y																
REZİMAN	R	E	Z	I	M	A	N	W	E																		
APARIMIND	A	P	A	R	I	M	I	N	D																		
EWLEKARNE	E	W	L	E	K	A	R	N	E																		
AZAM	A	Z	A	M																							
ERBİLT	E	R	B	I	L	T																					
GOTÜGO	G	O	T	Ü	G	O																					
REXTOR	R	E	X	T	O	R																					
VEHESTIGE	V	E	H	E	S	T	G	E																			
PEYVA VEŞARI	P	E	Y	V	E	S	A	R																			
ORKMAR	O	R	K	M	A	R	M	A																			

### Bersiva Xacepirsa 34'an

Xacepirsa me bixelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binrixînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 36'an pirtûka

Kasetta Koma Berxwedan  
“Namêmîn Mezopotamyâ” ye. Jérénöt:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarı” di nava qutîyên li bin xacepirse de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bigînin.

Kesênu ku xelata xacepirsa 34'an, pirtûka Rojen Barnas “Milkê Evînê” qezenc kirine: Qadiye Yılmaz/ Batman, Sabîh Gümüşsoy/ İzmîr, Bakûr Heja/ İzmîr, Abdullah Seziş/ Wan, Dilan Döger/ Amed, Abdurahman Dayan/ Tarsus, Memo Cindî/ Agîrî, Evdila Pütik/ Sert, Cemşit Hesen/ Qers, Feleknaz Batur/ Qurtalan



Bircek li Ciziré	8	Menzere		Gihane-kek		Xal, şanık a çekiri		Jinbay		Nıştiman
Jekirin		Radon		Merkez		Evdila.... (wêne)		Şalwar		
Fikir				5		Nikel				
Aktinyûm		4				Cureyeke xenceran Gelek tûj				3
Avjeni		Eşq		10			Ziman giran			
Kulav	7	Naveki jinan		Osmîn-yûm			Küçik			
Lehengê “lampeya bi efsûn” Amûr		Sodyûm		Xomal		Zumre				
Encam, netice		Cureyeke Bombayan				Şaireki Başûrî				
							Nan li ser dipêjin			
							6			

PEYVA VEŞARI





## Serxweşî

Bavê Berpirsê Karêñ Nivîsaran ê rojnameya me  
Düzung Deniz, Ali Murat Deniz  
roja 30'ê meha rezberê (ilonê)  
çû ser dilovaniya xwe.  
Bila serê Malbata Deniz xweş be

Xebatkarêñ Azadiya Welat

## Bila berpirs bêñ darizandin

Îro zîndan bûne cihê mirinê, di dema cûntaya 12'ê rezbera  
ala 1980'yî de jî ev çend dîl û girtî di girtîgehan de nehatin  
jîstîn.

Ev kirin, ne encamên rîveberiyê nepak û îhmalan e,  
isterast ji ber polîtikayên rejîmê diqewimin.

Qetîama Zîndana Amedê careke din da nîşan ku rejîm bi ci  
avî li dîl û girtîyan dînihêre. Ji van bûyeran rejîm bi xwe  
berpirs e. Em di şexsê bûyera li Zîndana Amedê hemû kîrinê  
i vî rengî şermezar dîkin.

## Azadiya Welat

## Bang ji bo damezirandina Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê

Îro têkoşîna neteweya kurd gîhişîye lütkeyê. Me sazkirina yekîtiya nivîskarêñ Kurdistanê ji xwe re kiriye armanc. Nivîskar di  
baxçeya ronesansa şoreşa Kurdistanê de şergerêñ ramanî ne. Bi bir û baweriya me, pêkanîna Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê  
pêwistî û gaveke dîrokî ya li ber me ye.

Evêñ ku bikaribin li ser erdê Kurdistanâ parçebûyi, ji 73 sal berê heta îro şînbûna jiyana kurdan, asîmîlasyon, zordarî û trajediya  
i nasnameyî bînin ziman, nivîskarêñ Kurdistanê ne.

Nivîskarêñ Kurdistanê divê bikaribin di paşeroj û îro de serhildanê civakî, ji Koçgîrî heta dema aktuel serhildanê gelê Kurdistan  
û binexşînin û berhemêñ xwe yadigarî nifşen pêşerojê bikin.

Sebra me, inad, hezkirin û hêza me, qelsbûna me bi destê Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê dê were bizimankirin û bibe destpêka  
nahî û bersiveke kolektîf, li hemberî mijokeriya ku li dijî têkoşîna azadiya gelê kurd disekine.

Hêviya me ev e, nivîskarêñ kurd ci li derive, ci jî li welêt di bin banê rîexistineke neteweyî de bigîhin hev. Em wekî komîteya amâ  
ekar, dîtina wan ci dibe bila bibe, em hemû nivîskarêñ Kurdistanê, ji bo damezirandina Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanê vedixwî  
in.

### Komîteya Amadekar:

Yaşar Kaya, M. Sıraç Bilgin, M. Emin Pencewînî,  
Dilbixwîn Dara, Amed Tigrîs, Selîm Ferat,  
Haydar Işık, Medenî Ferho, Kemal Mirawdelî

Neyaro/ Xwînxwaro kotîbiyo  
Bêbexto hey belqîtiyo/ Devgirêzo, gemaro!  
Bes ev nemiroviya te/ Haveynê te ji hovîti  
Kirasê te durûtî/ Emê bistînin ji te/ Her bi zal i.

## Ey Şehîd..

Belê, bila ew xiltêñ kor, baş bizanibin ku standina  
tola we, dîsa bû sond û pîvana xîreta welatperweriyê,  
pakrewaniya we ji bo me sirûda şoreşê ye.

Cengebaziya we, cengeweriya we bûye pêt, tariya  
xwînrijiyê diçirîne. Hûn di êrişâ Zîndana Amedê de  
şehîd ketin.

**Edîp Direkçi, M. Nimet Çakmak, Erkan  
Perişan, Rıdvan Bulut, Hakkı Tekin, Ahmet  
Çelik, M. Sabri Gümüş, Cemal Çam, Kadri  
Demir, Mehmet Aslan, İskan Oral**

Emê bîranîna wan bi baweriya zexim bidin jiyandin.  
Şehîdîn Zîndana Amedê banga serxwebûnê ne!

*Ji Girtîgeha Umranîyeyê  
li ser navê dîlîn PKK'yî Yaşar Çelik*

### Ji bo têkiliyê:

Tel: 0049 030 682 11 45  
Faks: 0049 030 881 02 43  
Cih: Alte Feuerwache, Melchior Str. 3  
50670 (Ebertplatz) Köln  
Dem: 12. 10. 1996

# WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMÎ TAN  
RAHMÎ BATUR

Berpirsê Karêñ  
Nivîsaran  
(Yazî İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÎN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpâyê:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost  
Helim Yûsiv  
963-21-960099

Berlin:  
Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360


Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037  
Stockholm:  
Robin Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49  
Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Stareya qaçax û evîndaran: Dêra Axtîmanê

Li gorî dîrokzan,  
dengbêj û rîspiyên Wanê,  
Dêra Axtîmanê di dema  
osmaniyan de bûye  
stareya qaçax û evîndarêñ  
kurd û ermeniyan.  
Yek ji wan jî Meyrema  
ermen û Eliyê kurd e.  
Evîna Elî û Meyremê iro  
ji aliyê dengbêjê Wanê  
H.Evdilkerîm, Sidiqo  
û yên mayîn ve bûne kilam  
û li civatan têne gotin.



**d**êra Axtîmanê di salêñ 915- 922'yan de ji aliyê Qral Vaspurakan ê I. Gayîk ve hatiye çêki-rin. Dêr, ewîlî ji bo qesra qral hatiye çêki-rin lê dawiyê bûye manastir. Mîmarê dêrê keşîşekî bi navê Manuel bûye.

Li gorî mîtolojiyê, Girava Axtîmanê navê xwe dîsa ji evîna keç û xortekî standiye. Dibêjin keçek bi navê Temara û xortekî ji gundê li dora Gola Wanê pir ji hev hez kirine. Xort şivanî kiriye, lê melevanekî (avjen) pir jêhatî bûye. Her roj melevanî kiriye, heyâ giravê

çîye, Temara dîtiye û bi şûn de zîvirîye. Rojekê dîsa ber bi giravê ve melevanî kiriye û nêzîkî cihê hevditinê bûye, vê demê bagerek li nava golê çêbûye; wî xorfi nekariye xwe xelas bike, li ber çavê Temarayê gotiye "ax.... temara" û xeniqiye.

Wê çaxê navê giravê bûye Girava Axtemara û iro jî wekî axtîmanê tê bilîvkirin.

Di nav dîroka gelê kurd û ermen de Girava Axtîmanê û dêra wê cihekî mezin digire. Girava Axtîmanê û dêra li ser, wekî rîzeke ji morî û mircanan pir delal e.

Mixabin, osmaniyan û komara tirk

gelek parce ji Dêra Axtîmanê birine. Dewleta nijadperest a tirk iro jî berhemîn kevn, yên kurdan, ermeniyan winda dike: Yêñ ku ber bi xerabûnê ve jî diçin restore nake. Bi kurtasî dixwaze dîrok û berhemîn gelan winda bike.

Lê Dêra Axtîmanê iro jî li ser piyan e, bi delaliya xwe. Li gorî dîrokzan, dengbêj û rîspiyên Wanê, Dêra Axtîmanê di dema osmaniyan de bûye stareya qaçax û evîndarêñ kurd û ermeniyan. Yek ji wan jî Meyrema ermen û Eliyê kurd e. Evîna Elî û Meyremê, iro ji aliyê dengbêjê Wanê H. Evdilkerîm, Sidiqo û yên mayîn ve bûne kilam û li civatan têne gotin.

## Serpêhatiya Eliyê kurd û Meyrema ermen

Rojekê Waliyê Wanê û xulamê wî Elî, li nav sûka bajarê Wanê digerin, danûstandinê dîkin; diçine dikanekê; wê demê keçeke pir delal jî dikeve hundirê dikanê. Wali û Elî ji ber delaliya Meyremê heyirî dimînin û her du jî dîbin evîndarê wê. Piştî ku keçik jî dikanê derdikeve, Wali ji Elî re dîbêje: "Elo ez ketime ber bextê te tu bizane ev keç e, yan jin e, an ci milet e û were ji min re bêje."

Elî bi dû keçikê dikeve û xwe digîn, jê dipirse:

"Xatûna delal ez xulamê Walî me, emirqûl im. Walî dipirse ka tu kî yi?"

Meyrem bersiva Elî dide:

"Xortê hêja û delal, ez Meyrema er-men im, tu dev ji walî berde, ka tu kî yi, ji kîjan gelî yi?"

Elî bersiva Meyremê dide û zû diçen qonaxa Wali. Rewşa Meyremê ji Wali re dibêje. Wali careke din Elî ji xwe re bi xwezgînî dişine cem Meyremê. Elî dibêje:

"Meyrema delal bi rastî dilê min naxwaze ez bibêjim, lê nebêjim jî Wali wê serê min jê bike; Wali te ji xwe re dixwaze û şertê de dipirse."

Meyrem:

"Elî dilê min ne di Waliyê heftê sa-lî de ye: Dilê min di te de ye."

Elî bi vê bersivê pir şad dibe û dibêje:

"Meyrema delal, dawiyê Wali wê me bikuje, emê bi ku ve herin, herin ku xelas bibin? Hemû alî di destê leşkerê osmanî de ne?"

Meyrem:

"Emê li qeyixê (lotkê) siwar bibin û herin Dêra Axtîmanê û emê xwe bia-vêjin ber bextê Keşîş Metran. Metran pir bibext e, wê me biparêze."

Li ser vê gotinê Elî û Meyrem li lot-kê siwar dîbin û di ser Gola Wanê re xwe digîhîn Girava Axtîmanê, cem Keşîş Metran. Keşîş wan diparêze û meleyekî misilman jî tîne mehra herduyan dibire.

Walî, vê bûyerê seh dike, tevî hêzîn xwe li lotkan siwar dîbin û dora Girava Axtîmanê digirin. Wali bangî Metran dike:

Wele nakim bile nakim  
Lo Metrano qebûl nakim  
Meyrê Elo ra yar nakim  
Dêrê serê we da xira kim."

Metran:

Wele nabe, bile nabe  
Bextê Metran xirab nabe  
Mehra cana û pîra nabe  
Dêr qahîm e xira nabe.

Wextê xeberêñ wan nabin yek, şere-kî mezin li dora girav û dêrê çêdibe. Kurd û ermenêñ li dora Wanê jî bi vê bûyerê dihesin û diçine alîkariya Metran. Di dawiyê de bi yekîtiya her du gelan Walî tê kuştin. Leşkerê osmaniyan bi paş ve vedigerin. Eliyê kurd û Meyrema ermen bi mirada xwe şad dîbin.

Çavkanî:

Dengbêj H. Evdilkerîm û Sidiqo  
Pirtûka li ser Wanê ya  
"Kültür Bakanlığı Yayınevi  
ŞEWQÎ ELBAK"

